

ARMANÇ
Ji mehê
carekê
dertê
Hejmar: 111
Çileya Pêşîn
1990
Buha: 15 Skr.
3 DM

Armanç

ARMANÇ
Monthly
Kurdish
Magazine
No: 111
December
1990
Price: 15 Skr.
3 DM

SERXWEBÛN DEMOKRASÎ SOSYALÎZM

Lice:

Şer di navbera millet û hêzên mêtîngehkar de derket

◆◆ Jineka Kurd a bi navê Qudret Filîz û lawikekî 12 salî bi navê Hadin Dalan bi gulên dijmin şehîd ketin, hin kes birîndar bûn, 40 kes hatin girtin

◆◆ Komela Mafên Mirovayî ya Diyarbekirê, heyetên partiyên siyasî yên ku li herêmê tehqîq vekirin di buyerê de hêzên ordiyê û berpîrsiyarên siyasî yên dewleta Tirk rûş kirin



Wek herêmên din ên Kurdistanê dorûberê Licê jî bi taybetî van salên dawiyê di bin êrîşêk hov û har a dewletê de bêzar bûne. Cendirme, milîs, polis û hêzên kontr-gerilla yên Tirk her roj êrîşê dibin ser gundan, dixwazin gundiyan ji cî û warên wan rakin. Ev êrîşkarî bi taybetî li gundên Dêrxwistê, Husênîkê, Dih-belo û çend gundên din kêr gîhand hestû. Roja nehê mehê xelkê û dikandaran ev êrîşkarî û hovîtî protesto kirin, xelkê dikanên xwe girtin. Li ser vê yekê hêzên mêtîngehkar çavsorî bûn,

hin kes girtin û êrîşên li ser xelkê xurttir kirin. Lê xelkê jî çavê xwe ji vê êrîşê neşikand, gundî û bajarî, bi jin û mêrên xwe, bi mezin û biçûkên xwe, daketin kolanan, meşek bi girseyî ber bi qonaxa hukû-

metê ve li dar xistin. Li ser vê yekê polis û eskeran meşvan gulebaran kirin, dest bi girtin û lédana xelkê kirin, di êrîşê de jinek bi navê Qudret Filîz û lawikekî 12 salî bi navê

Dûmahîk: r. 9

**Li Ceylanpinarê
gundî mecbûrî
barkirinê dibin
r. 9**

*Em ser sala hemû xwendevanên xwe bi dil û can
pîroz dikin û hêvîdar in ku sala 1991'ê ji bo gelê
Kurd bibe saleke ronahiyê, serbestiyê û aştiyê!
Redaksiyona Armançê*

Vedat Aydın di mahkemêde jî bi Kurdî axaft

◆ Mahkema Vedat Aydın; nunerê Komela Mafên Mirovayî ya Diyarbekirê û ya Awûkat Ahmet Zekî Okçuoglu di 18'ê Çileya Pêşîn de çêbû

◆ Vedat Aydın di bersivdana serokê Mahkema Ewlekarî ya Dewletê de red kir ku bi Tirkî biaxive, bersîva hakim bi Kurdî da. Ahmet Okçuoglu û Musfata Ozer jî red kirin ku li ber navên wan "Tirk" bê nivîsandin gotin "em ne Tirk lê Kurd in"



Vedat Aydın(yê milê çepê) Ahmet Okçuoglu û Mustafa Ozer di mahkema Anqerê de

Dawa ku di derheqê Vedat Aydın, Ahmet Okçuoglu û Mustafa Ozer de li Mahkema Ewlekarî ya Dewletê hatibû vekirin, roja 18'ê Çileya Pêşîn li Anqerê dest pê kir. Wek tê zanîn Vedat Aydın di Kongra Komela Mafên Mirovayî ya Tirkiyê de, li ser navê Komela Diyarbekirê bi Kurdî axaftibû û Awûqat Ahmet Okçuoglu jî axaftinên wî wergerandibûn Tirkî. Li ser vê yekê polîsan ew herdû û Mustafa Ozer(ku çima li hember girtina wan rawestiyabû) girtibûn paşê Mustafa Ozer hatibû berdan lê herdüyên pêşîn heta roja mahkemê girtû mabûn.

Roja mahkemê gelek awûqat ji Diyarbekirê, ji hin bajarên din û awûqat û rojnamevanên biyanî, gelek parlamenter û siyasîyên

Tirk û Kurd û ji ronakbîr û xelkên din kes li dervayê û hundirê mahkemê beşdarbûn.

Di tespîtkirina kunya dawlêkiriyan de Vedat Aydın red kir ku bi Tirkî biaxive. Serokê mahkemê her çendî jê pirsî ku ma bi Tirkî nizane, Vedat Aydın bi Kurdî bersiv da ku bi Tirkî zane lê dixwaze bi zimanê xwe yê zikmakî bipeyive. Li ser vê yekê hakim got ku "yê dozlêkirî bi zimanekî ku jê nayê fêmkirin diaxive" û xwest derbasî îfada her du kesên

din bibe, lê Ahmet Okçuoglu û Mustafa Ozer jî gotin ku heta îfada Vedat Aydın neyê girtin ew jî îfade nadin. Pişt re wan red kir ku di şûna kunya wan de "Tirk" bê nivîsîn û wan got ku divê "Kurd" bê nivîsîn. Li ser vê yekê heyeta mahkemê 10 deqîqe navber da dawê, piştî vegeerê biryara xwe eşkere kir ku Vedat Aydın û Ahmet Okçuoglu jî bîn tahliyekirin û mahkeme rojek din dewam bike.

Dûmahîk: r. 9

**Nama Vedat Aydın
r. 2**

Nama Vedat Aydın

Namek Vedat Aydın li ser axaftina wî ya bi Kurdî ya di Kongra Komela Mafên Mirovayî de û duv re girtin û mahkemekirina wî ket destê me. Em vê namê bi Kurtî li vir diweşînin.

ARMANC

(...) Berî ku em biçin Kongra Komela Mafên Mirovayî, li Diyarbekir wek delegasyona Diyarbekirê em di nav xwe de civiyar û em biryar da ku yek ji me di kongrê de bi Kurdî biaxêve. Min ev wazîfe girt ser milê xwe. Em çûn Kongrê.

Berî min, di kongrê de, serokên Şûbên Wanê, Diyarbekirê, Sêrtê li ser îhlalkirina mafên mirovayî bi firehî bi Tirkî axaftin. Piştê ez rabûm. Li dîwanê serok awûqatê meşhûr xwedêgiravî parêzgerê şoreşger û pêşverûyan, aktorê serekî dawên siyasî Halit Çelenk bû. Min bi Kurdî destpêkir, silav li kongrê kir. Pêre serokê dîwanê mudaxale kir got: "ji kerema xwe re yê ku diaxêve, bira axaftina xwe bi zimanekî wilo bike ku em jî tê bigihên." Min jî got ku "ezê axaftina xwe li gor mafê xwe yê her tebiî bi zimanê dayika xwe bikim. Qesda min jî vê jî ew e ku di civînek wiha de li ber parêzgerên mafên mirovayî bidin nîşandan ku divê li herderê bi serbestî mafê xwe yê mirovayî yê tebiî, mafê axaftina bi zimanê zikmakî bikarbinim. Divê parêzgerên mafên mirovayî xwedî li vî mafî derên. Divê em raya giştî li hember qanûna 2932. ya ku Kurdî qedexê dike, hişyarbikin. Jê pêşîr divê di pratîkê de em vê rûreşiyê qebûl nekin, nasnekin. Loma ez bi Kurdî diaxêvim." Ev guftûgo di navbera me de bi Tirkî dibû. Û bi Kurdî min axaftina xwe domand. Li ser vê yê serok got: "yê axaftvan ji kerema xwe re axaftina xwe bibirre, yan na emê mecbûr bin ku axaftina te bibirrin." Min got: "Ez nabirrim, lê fermo hûn axaftina min bibirrin." Lê ji bo ku karibe axaftina min bibirre. divê ba polîsan bikira. Ji muxalefeta hundirê salonê cesaret nekir vê yekê bike, ji dêlê vê dîwanê terikand. Piştî wî dîwan terikand, Ahmet Okçuoglu hat cem min got: "tu bidomîne, kî bixwaze fam bike ezê ji bo wan taxume bikim." Yanî ew jî bû şirikê sucê min.

Tabîî ev şêla Halit Çeleng, bû sedemê ku polîs rabe êrişê. Polîsek di salonê de hat nik min, got "deqeqê bi min re we re derva". Min got " navê min Vedat Aydın e. Hûn dixwazin, adresa xwe jî bidim we. We axaftina min jî bi vîdeoyê girtiye. Çi lazim e, bikim, bira dawe ve be. Emê werin xwe biparêzin, em narevin tu derê. Polîs got: "zahmetiyar demexê, bi me re were". Min jî got "ez kongrê taqîb dikim, dernakevim, bicehime here, bi vê yekê salonê jî hucûmî ser wî kir, mêrik vekîşiya çû.

Lê piştî vê li dervayî salona kongrê bi hezaran polîs civiyar.

Yên salonê, haya parlementerên HEP'ê pê xistin, ew jî hatin li salonê ciyê xwe girtin. Piştî çend axaftinan parlementer Fehmî İşıklar û salih Sumer di milên min de em derketin derva. Meriv ax bavêta ji qelebalixê nediketêrdê. Gava me xwest em li erebê siwar bin, polis hatin gotin: "Fehmî Beg zahmetiyê ji bo me demexin, emê ifada wî bigrin." Min jî got: "de fermo em herin" û em li ereba wan siwarbûn çûn qereqolê. Hemû delegan û qelebakixê bi çepikan ez rêwî kirim.

Piştî min Ahmet Okçuoglu û Musfata Ozer jî anîn qereqolê. Roja çaran ifada min girtin. Çavê min girtî ez daxistim jêra bînayê, li salonekê ez dam rûniştin, çav girtî, bi awayê hergavî dest bi ifada min kirin, gotin:

"Binêre tu çi dişibî merivekî saf û paqij çi ruyekî te yê nûranî heye." Min got "Subhanallah we ji ku ev yek dîtî, ma kerametekê we heye?" Wan jî got "ji xwe her gav wiha dibe, yên wek te bikartînin. Ma ji te pê ve kesekî ku bi Kurdî bixwazî tunebû?" Min jî got:

"Hebû, bi kêmasî ji sedî bîstûpêncê salonê bi Kurdî zanibûn."

- "Baş e çima kesî din ne peyivî."
- "Çi ferq dike. Niha kî di şûna min de li vir bûna wê ev pirs ji wan jî bihatana kirin. Vê carê ji qewlî misilmanan, bû nesîbê me."

Gotin: "Te di vê salona dewletê de, bi zanebûn ji qesdî Kurdî qise kir." Min jî got: "erê bi zanebûn û qesd ez peyivîm. Di Kongra Komela Mafên Mirovayî de, ji parêzgerên mafên însana min daxwaz kir ku li hember qedexekirina zimanê meyê zikmakî; vî karûberî neînsanî rawestin. Min jî herkesî Tirk, Arap, Faris, Îngilîz, Fransîz herkesî daxwaz kir ku xwedî li vê dozê derkevin. Ez ji we yên ku li vir ifada min digrin û ji hakimînan yên ku sibê wê mehkema min dikin daxwaz dikim ku hûn bi vê mesela însanî bibilin. Em destê xwe direjî we dikin. Metirsin destê xwe bidin me, em we xelas kin."

Vê carê gotin:

"Ma Kurdî qedexê ye. Binêre li Diyarbekirê, li Balıkcılarbaşıyê, tiştîroş bang dikin dibêjin "çar kilo bi hezarî" kes bela xwe di wan dide?" Min got:

"Baş e min çi got. Min jî li Anqerê her ev tişt got. Binêrin krawata min li ser min e, ne çekdar im, bîhna barûdê ji min nayê. We ez girtime anîme vir, çavê min girtiye, çar roj in ez birçî hiştme." Gotin:

"Baş e tu kesê ku tu teşwîkî vê axaftinê kir tunebû?"

"Helbet hebû"

"Kî bû?"

"Diyamin e. Peyvekî jî bi Tirkî nizane. Bavê min li eskeriyê Tirkî hîn bû. Min gava dest bi dibistanê kir, ez hîn bûn. Bapîrê min gava çû gorê peyvek Tirkî nizanibû. A ji bo ez bibim tercumanê hissên wan min ew axaftin kir. Ji iro pêve îdî hûnê rastî gelek kesên wiha bîn." Piştî hemû vê sohbetê gotin:

"Tu Tirkî yan na?" Min jî got:

"De îja eyb e, piştî hewqas xeberdan hûn pîrsek wiha ji min dikin. Xwe ne hûn ne li hêviyê ne ku ez bêjim 'ez Tirk im'."

Di navberê re gotin "Sohbeta te xweş e, ma em bidomînin?" Min jî got:

"Bi şertekî, çavê min vekin, xwarinê bînin ez bixwim, hûn çiqas bixwazin emê sohbet bikin. Gotin: "Na nabe, xwarinê tamam, lê çav vekirin qet nabe." Min got: "Ez jî çavgirtî û bi zikê birçî neaxivim."

"Tu bixwazî, dikarî ifade jî nedî."

"Na tiştê ku ez dibêjim, hûn wan binivîsin ezê ifade bidim. Yan na ez nadim."

"Ji xwe berî ku em bi te bidin xwendin em ifada te bi te nadin îmzekirin."

Piştê gotin: "kengî tu çûyî jor tê ifade bidî" û ez şandim.

Roja nehan em birin mahkemê, li wir min got:

"Ez qebûl dikim ku wê ifada polîs min daye, lê ji bo ku ewqas roj çavgirtî û birçî mam ez vê yekê jî îşkence qebûl dikim û ifada xwe loma red dikim". Li gor ifada min û li gor tercuma Ahmet îdînamek hazir kiribûn.

Berê di lêpîrsîna polîs de gotibûn ku "bêjin me bi qesdî û zanatî ev axaftin nekiriye, ji bo em we berdî." Me jî ev yek qebûl nekiribû, loma ez û Ahmet Okçuoglu em girtî man, Mustafa Ozer berdabûn.

Gava em hatin hefsê, ji her derê welêt ji nas û nenasan bi taybetî jî ji hefsan me gelek telegrafên pîrozbahî, silav û piştigiriyê girtin, nav û dengê me gîhaşt wî alî okyanûsan.

Gava em derketin mahkemê, min bi Kurdî dest bi axaftina xwe kir. Li hesabê wan nehat, zû zû gotin, "şikjêkirî bi zimanekî wilo diaxêve ku jê nayê fêm kirin". Û xwestin dawê bincil bikin. Min got:

"Naxwe zimanek e ku jê nayê fêm kirin, ez ê wê gavê çawa karibim hissên milî zeîf bikim. Û ya din, 20 milyon însan bi vî zimanî dipeyivin". Gava min ev yek got Ahmet Okçuoglu nuquçand min got: "ne bîst, sîh milyon". Min jî bi hêz got: "Bes li Tirkîyê bîst milyon". Teber ez hemû van peyvên bi Kurdî dibêjim. Loma jî naxin zeptan.

Carekê min got ev "dawek polîtîk e". Hakim wek tiştê kişî kiribe got "yê şikjêkirî du peyv bi Tirkî gotin" min jî bi Tirkî got "her du peyv jî ne bi Tirkî ne". Lê ez poşmam bûm, min li çoka xwe xist. Çimkî hakim got "a ha yê şikjêkirî, bi Tirkî zane lê bi qesdî napeyive". Li ser vê min got:

Li ser îthama nasyonalîstiya Kurdan jî E. Okumuş got: "Gelê ku şexsiyeta wî, gurûra wî ya netewî, zimanê wî, nav, welat û tarîxa wî ji dest hatibe stendin, ew gel nikare bibe nasyonalîst." Di dawîya civînê de ji bo ku ji Sekreterê Koma Netewan re, ji Komîta Parlamentaran a Komîsyona Ewropa re, ji Serokkomarê Tirkîyê Turgut Ozal re û ji Serokwezîrî Swêd ji Îngvar Carlsson re bête şandin

Panêla

"Tirkîye, Turîzm û Îşkence"

M. Bellî: "Sicîla Osmanîyan ji ya Rojava paqijtir e. Ewropî toleransê ji Osmanîyan fêr bûne. Kurdên ku ji Netewên Yekbûyî, ji Komîsyona Ewropa û ji hin dewletên Ewropa alîkariyê dixwazin ew ji Ewropîyan parsê dikin û ew nasyonalîst in."

Komela Neteweyên Yekbûyî ya Swêd her sal roja 10'ê Çileya Pêşin wek rojeke mafê mirovî yê navnetewî pîroz dike. Komelê isal ev roj tahsîsî Tirkîyê kir. Ji bo munaqesekirina van meselan komelê, parlementerê Sosyaldemokrat yê Swêdê Hans G. Franck, Parlamentarê HEP'ê Adnan Ekmen, nivîskar Mihri Bellî û rojnamevan Eşref Okumuş vexwendibûn panelê.

H. Franck di axaftina xwe de li ser rewşa xirab a hefsên Tirkîyê sekîni û li dijî cezayê îdaman derket. A. Ekmen jî, ji zulm, zor û terora ji alî dewleta Tirkîyê li Kurdistanê tê meşandin gelek numûne da. Axaftina wî gelekî bala guhdaran kişand.

Nivîskar M. Bellî jî di axaftina xwe de li dijî wan kesên ku li Tirkîyê rexne girtibûn, derket û got ku: "Sicîla Osmanîyan ji ya Rojava paqijtir e." M. Bellî hîn jî pêş de çû û got: "Ewropî toleransê ji Osmanîyan fêr bûne. Û ji bo Kurdên ku ji Netewên Yekbûyî, ji Komîsyona Ewropa û ji hin dewletên Ewropa alîkariyê dixwazin jî got ku, ew ji Ewropîyan parsê dikin û ew nasyonalîst in.

Rojnamevan E. Okumuş di axaftina xwe de rexne li M. Bellî girt û got: "Wek M. Bellî, mafê herkesî ye ku ji dewleta xwe hez bike, lê belê çî mixabin hezkirina ji dewleta Tirk ji dewleta Tirk ne serbilindiye, divê meriv jê şerm bike.

Li ser îthama nasyonalîstiya Kurdan jî E. Okumuş got: "Gelê ku şexsiyeta wî, gurûra wî ya netewî, zimanê wî, nav, welat û tarîxa wî ji dest hatibe stendin, ew gel nikare bibe nasyonalîst."

Di dawîya civînê de ji bo ku ji Sekreterê Koma Netewan re, ji Komîta Parlamentaran a Komîsyona Ewropa re, ji Serokkomarê Tirkîyê Turgut Ozal re û ji Serokwezîrî Swêd ji Îngvar Carlsson re bête şandin

van biryarên jêrin hatin stendin:

1) Li Tirkîyê îşkence dibe, divê bê ku west bê derbaskirin ev îşkence bê sekinandin.

2) Rewşa xirab ya girtigehên Tirkîyê divê tawilê ji navê rabe.

3) Divê ji azadiya bir û baweriyê re hurmet bête nîşandan. Û mafê axaftina bi zimanê diya xwe bê qabûl kirin.

4) Divê mafê her kesî hebe ku di sendikan de, di partiyên de xwe organîze bike

5) Divê sansur tawilê rabe

6) Divê efûyek bi giştî ji bo kesên siyasî û ji bo wan kesên ku ji ber dîtinên xwe yên siyasî li surgûnê ne bête derxistin. Divê van kesan bêyî ku ceza bibin bikaribin vegerin warên xwe.

Li ser rewşa Kurdistanê ji van biryaran hatin girtin:

a) Divê li rojhilat û li başûrê Tirkîyê rewşa idara urfî rabe

b) Divê maqamê Waliyê Taybetî bête rakirin.

c) Divê qerarnameyên ji bo Kurdistanê bîn îptal kirin.

d) Milîsiya gundan divê rabe.

e) Ji herêmê surgûnkirina ne mirovî divê bête sekinandin.

f) Girtina ser gundan, girtinên bi girseyî û valakirina gundan divê tawilê bête sekinandin.

7) Di konferansa Ewlekarî û Hevkarî ya Ewropa de ku wê dawiyê li Parisê civiya nûnerê Tirkîyê bi bahana krîza Xelîcê xwest ku Rojhilatî Tirkîyê li dervayî peymana giştî ya ji bo aşî û aramiyê bimîne. A ji xwe ev herêm ew ciyê ku mafên mirovayetî lê tê îhlal kirin. Em li dijî ku daxwazek wiha bê qebûl kirin.

8) Em daxwaz dikin, divê serbestî û mafên demokratîk ji bo gelê Kurd ji derbas bibe.

9) Em daxwaz dikin, divê mesela di der heqê Kurdan de û sîcên li hember vî geli hatine kirin bê Netewên Yekbûyî.

Dûmahfk: r. 9

<p>Redaksiyon: M. Eli, Zinarê Xamo, Hesên Mizgîn, Lewend Firat, Mirza Bextiyar. Redaktorê berpirsiyar: M. Eli Berpirsiyarê beşê Dimilkî: Malmisaniş</p>	<p>Adres: Armanc P. Box: 6004 172 06 Sundbyberg Sweden</p>	<p>Telex: ATTN ARMANC 11083 TELE KC Telefax: ATTN ARMANC 46-8-801825</p>	<p>Ansvarigutgivare: Kurdiska Demokratiska Arbeter Unionen Postgiron: 50 37 99-9 ISSN: 0346 7385</p>
---	--	--	--

Hukumeta Swêd dixwaze xwendina zimanê zirkmakî rake

Bareş Battê

Di vê sala dawî de rewşa dewlata Swêd di warê aborî de ber bi xerabî diçû. Hukumeta sosyal demokrat ku her tim bi alikariya partiyek din hikmê xwe dimeşand vê carê kete nava neçariyek mezin û bi hatina kirîza "Saddam" jî kete nava Kefteleftek gelek xerab. Ango Aboriya Swêd divabû bi pakêtek aborî bi awayê "Kirîz" bête rastkirin û ji nû de rewşek aborî, yek domdar bête sazkirin.

Helbet gelek faktorên din yên ku bûne sebebê vê "Kirîzê" hene, lê emê li ser rewşa xwe biyaniyan -mihaciran- bi giştî û li ser rewşa "xwendina zimanê zirkmakî" bi taybetî bûyerên dawî di vî warî de hinekî ronî bikin.

Wekû tê zanîn li Swêd û bi giştî li hember "hatina miha-cirên siyasî" jî bo "karpêdana miha-cirên siyasî", li Swêd û a herî dawî jî "xwendina zimanê zirkmakî" li dibistanên Swêd gelek hêrîşên bê ûjdan û neheq hatin kirin û tene kirinê. Li hember van hêrîşan, hukumeta Swêd van rojên dawî jariya xwe bi vê "pakêta kirîza aborî" baş daye xuya kirin. Êdî sosyal demokrat an jî demokratê sosyal dixwazin hevalbendiya dewle-mend û rasistên Swêd bikin û bi van metodên hanê ew jî kêra xwe li me ketiyên biyanî bixin. Ew jî êdî hevalê xurta ne. Bi kurtî pêşniyara hukumatê ev e:

a) Karûbarê xwendin û perwerdekirinê û organîzekirina mamosteyan êdî dikeve bin berpirsiyariya belediyên Swêd. Her belediyeyek wê bi xwe îdara xwe bike.

b) Alîkariya Dewletê ya aborî bo xwendin û perwerdekirinê di binê yek navî de û bi komekê tê kirin. Beledî di bikaranîna van peran de azad e. Bixwaze; wê "zimanê zirkmakî" bide xwendin, nexwaze wê nede xwendin. Beriya niha hinek pere jî bo "zimanê zirkmakî" û bi taybetî bi navê "zimanê zirkmakî" di nava vê alîkariyê de dihat bi nav kirin. Hingê belediyên nikaribûn zarokên biyaniyan ji xwendina zimanên wan yê biyanî- zirkmakî bê par bikin.

c) Niha jî meqamekî bi navê (RRV) ku berpirsiyarê kontrol û lînerîna kar û xebata dezgehên dewletê ye, bi taybetî bi hêrîşek ne demokratîk û çewt di rapora xwe de li dijî xebata ku di warê "xwendina zimanê zirkmakî" de dibe derketiye û dibêje ku ev "xwendina zimanê zirkmakî" gelekî biha ye û gelekî xerab tê kirinê. Ew daxwaz dikin ku weha bête kirin:

1- Xwendina zimanê zirkmakî paşî qedandina dibistanê, yanî paşî seet 4 ê rojê. (taktîk ew e ku wê hingê kesek nexwaze bixwîne û wê bi carekê jî holê rabe)

2- Divê komên xwendekaran yên mezin bêne çêkirin. (ji bo vê jî tu imkan tunin.) Hingê wê bêjin; "ma ne deh kes tunin, komek çê nabe" wê çaxê heger neh kes hebin jî di komekê de wê mafê xwe yê xwendinê ji dest

berdin. Ev sistema "xwendina zimanê zirkmakî" li Sowyetê heye. Bi kêmayî deh kes (Şagirt) ji zimanekî divê hebin heta ku bi karibin zimanê xwe bixwînin. Nebin ew ziman nayê xwendin. Bi gotineke kurt daxwaz ew e ku vî mafê demokratîk û mirovî jî dest me biyaniyan derxînin.

Ew wê me û zarokên me bê maf û bê ziman bihêlin, da ku em hîn zûtir asîmîle bibin û bo vî welatê nuh (Swêd) bibin paqij-karê, xizmetkarê zexm û xurt. Gelo çima "xwendina zimanê zirkmakî" pêwîst e:

Heger em weku pedegog (zanyarê karê mamoste û perwerdekirinê) li vê pirsgerêkê meyze bikin emê bibînin ku pedegogên binav û deng, çî ji aliyê rojava û çî jî ji aliyê rojhilat teva gotine û pewîstiya "zimanê zirkmakî" jî bo zarokê gelekî kifş kirine û di vî warî de êdî tu şik tunin. Bi kurtî dîtîna -fikra giştî ev e; "kesê ku zimanê dayika xwe, malbata xwe di zaroktiya xwe de baş fêr ne be, (heta salên çaran) di pêşketina xwe ya jiyana xwe de jî pêşketina xwe nikare tekûz bike. Jê re gelekî giran e ku zimanekî din baş fêr bibê û dîsa gelekî giran e ku tiştên nuh fêr bibe.

Ji ber vê xala han jî "zimanê zarokê yê zirkmakî û xwendina wî gelekî pêwîst e".

Îro li Swêd rewşek wiha xerab bo biyaniyan -mihaciran- peyde buye. Helbet ev serdestî wê me komikên piçûk bêhtir biêşîne. Zimanê me jî xwe li welatê me jî qedexa ye û em jî mafê mirovî bêpar in.

Heger em wekû dê û bav li mafê zarokên xwe xwedî dernekevin û li hember vê neheqiyê dernekevin wê rojekê zarokên me bi xwe me gunehkar bikin û bêjin "gelo em kî ne û çî ne? ". Hingê xuya dike ku em erkên xwe yên dê û bavîtiyê pêk nayênin. Divê wek dê û bav em li hember meqamên Swêdî protestê xwe bi nivîs û gotin bidin xuya kirin. Bi partî û kesên berpirsiyar re bipeyivin û wê daxwaza xwe wekû mafekî demokratîk û mirovî daxwaz bikin.

Komeleya mamosteyên zirkmakî li Uppsala û li bajarên din ev biryara ha ya hukumeta Swêd bi awayekî gelekî aktîv protesto kirin û hê jî berdewam e dikin. Li aliyê din gelek federasyonên biyaniyan jî ev tişt protesto kirine. Xebat hêdî hêdî tê nava belediyên. Divê ew daxwaz êdî jî berpirsiyarên belediyên jî bête kirin.

Her biyaniyekî -mihacirekî- li belediyekê rûniştiye, xwedî mafê hilbijartinê ye û dikare di organên belediyên de jî bête bijartin. Hêvî ewe ku her kes jî mafê xwe agahdar be û mafê xwe bikar bîne. Kurdno! Zimanê me jî xwe qedexa ye. Li hember vê zordestiyê rabin û li xwe û zimanê xwe, mafê "xwendina zimanê xwe yê zirkmakî" xwedî derkevin.

NECMETTIN

Mehmed
Uzun

Ji NECMETTIN BÜYÜKKAYA re

Birayê NECO, kekê delal,

Sala 1990'î ji me xatir dixwaze û diqulipe ser sala 1991'î. Meha Çilê û 23'ê meha Çilê dîsan tê. Ji wê roja 23'ê Çila 1984-an û vir ve, 6 sal derbaz bûn. Ji wê roja ku tu li girtîgeha eskerî ya Diyarbekirê şehîd ketî û vir ve 6 sal bihurîn. Sala 6'an diqulipe û dikeve 7'an. 7 salên bêyî te...

Niha, gava ez van rêzan dinivîsim, şevê dest pê kiriye. Şeva welatê bakûrê niha ber bi rojê nû dere. Lê ecêb e, şeva reş xwe bi rengekî spî radipêçe. Berf dibare. Kuliyên spî yên berfê li ber pencera min dilîzin. Berf, kuliyên berfê, rengê berfê zora reşa şevê dibin. Ronahî di şeva reş de diçirûse û kulî hêdî hêdî xwe berdidin jêr... Kuliyên berfê ku ji der ve dest li min dikin, heşê min ji oda min a biçûk a xebatê hildigirin û dibin derekî din. Heşê min ji welatê xerîbiyê bi firê dikeve û dere bajarê Siwêregê, welatê Kurdistanê... warê bav û kalan...

Sal 1961, roj Çile bû, haya min ji bayê felekê û gerîna dewranê nîn bû; ez zarokê 8 salî bûm. Kalikê min wefat kiribû. Kahniya ruh û can serê xwe danibû axa rehmetê. Em, malbata me, bav û apên min, heval û dostên malbatê li goristana bajarê Siwêregê bûn. Siwêrega xopan hê nû bûbû xwedî goristanekê. Deriyê goristanê bi sitûnan û kevirên mezin ava bûbû. Li dora goristanê dar hatibûn çandin. Goristanê haziriya umrekî dirêj dikir... Di dest-pêka goristanê de, gorek hatibû vedan. Kalikê min, bextiyarî û kêfxweşiya min di wê gorê de hatibû veşartin. Dinya ecêb bû... kalikê min, bêyî ku ji me xatir bixwaze, çûbû û hew vedigeriya... Berf dibarî, kuliyên berfê, bêyî ku haya wan ji tiştêkî hebe, dilîstin û bi nazdarî xwe berdidan jêr û li jêr, kirasekî spî dikişandin ser axa teze ya gora kalikê min. Dinya sar bû, lê ronî û pak bû. Goristanê spî dikir. Berfê ronahî reşandibû ser goristanê. Wê gavê goristan û mirinê mohra xwe li min xist. Heşê min ê zarok bi veqetîna kalikê min û ronahiya wê roja çilê hat risandin. Ew roj, ew goristan, ew ronahî bûn siya min û ketin pey min. Ez li kû, ew li wir... Gava, sala 1979, ez û te li Şamê, li goristana Taxa Kurdan, li ber qebra Mîr Bedirxan bûn û me li miriyên

welatê Kurdistanê dinihêrî, min ji te re got; aramiya goristanan bala min dikişîne û ew roja zaroktiya min û goristana Siwêregê ji heşê min dernakeve...

Goristana Siwêregê roj bi roj firehtir û dirêjtir bû. Bi dû kalikê min re, gelek nasên din jî, li wê derê, ketin xewa ebedî; pismamê min û dostê te Ferîd Uzun, bavê min, ap û birarziyên min... û niha jî tu... Wê goristanê tu jî, lawê xwe yê yekta[bi her wesfê xwe yekta] Necmettin Büyükkaya jî hambêz kir. Gelo wê, tu bi rêz û rêzdarî, bi qedr û qîmet hambêz kir? Gelo wê bi girîn û axîn, bi dilovanî û delalî bedena te ya xort rapêça? Gelo wê, doraliyê gora te bi rihanên mîna bejna te û bi gulên mîna rûyê te neqîşand? U îro, gelo ew goristana bav û kalan ji bo te dilorîne û strana te, xewna te, daxwaz û armanca te bi hemû welêt digihîne?

Bira, biracan NECO,

Mixabin ku ez heta îro jî nikaribûm bihatama ser gora te û gulek daniya ser axa te. Min ne gora bavê xwe, ne ya Ferîd û ne jî ya te ziyaret kiriye. Ev hesreta dilê min e... Lê gava min serê xwe danî diyarê rehmetê, hingê ez dixwazim veqerim goristana zaroktiya xwe û li kêleka te û Ferîd bikevim xewa ebedî. Hingê kuliyên berfê dê, mîna roja zaroktiya min, li ser gorên me govendê bigirin. Ev jî xewna min e...

Herçend min nikaribûye gulekê jî dayinim ser gora te, lê ez dizanim ku keça te, delaliya ber dilê te Serdil her tim gulên sor tîne û dide bavê xwe. Te hay jê heye; Serdil mezin bûye. Ev bûn 13 sal ku min jî ew nedîtiye. Lê li gora gotinan, ew bûye keçeke bi dilê te...

Heye ku niha ne şûna gotinê be, lê piştî ku eskerên bêbext tu li zîndana tarî ya Diyarbekirê kuşt, min xwest ji Serdilê re nameyêke dirêj binivîsim û jê re behsa te bikim. Mîna destanekê. Destana jiyana te ya pak, daxwaza te ya pîroz, dilê te yê xurt, heşê te yê serwext, baweriya te ya pola û wîcdanê te yê nerm... Lê min heta niha jî hê ew xelas nekiriye. Peyvên min ên xaf tîr nakin ku ez bikaribim wê biqedînim û bi Serdilê bigihînim... Bi rêdana te, ez dixwazim li vê derê rêzên pêşîn ên wê destanê binivîsim...

Ji Serdila mêrxasekî gorbehişt re çend gotin

Serdilê, gulîzerê... Keça delal, Roj giran, dil tenik, çav bi hêsir in.

Serdilê,
Ez çawan bibêjim, ji te re çawan bidim fahmkirinê...
Serdilê, ji îro pê ve,
Ji wê şeva reş a 23.01.84-an pê ve
Êdî ji devê te dê gotina BAVO dernekeve...

Axx Serdil, ax çivîka Bavo,
Wan kuştin... hêviyên te jî kuştin,
Dijimanan, dijminên hêviyên te,
Di şeva tarî de
Li pey cax û deriyên hesin
Bi bêbextî hêviyên te vetisandin.

Axx Serdil... di rojên weha tu giraniya gotinan namîne. Reh diguşişin ser hev, dil ditengize, mêtî naxwaze bedenê bi rê xîne... Li min bibihure ku ez nikarim bi zimanekî xweşik û nermik bi te re bipeyivim...

Dijwar e, Gulîzerê dijwar e.
Li welatê me jiyana dijwar e.
Li ser şehîdbûna hevalekî peyivîn, yan nivîsîn, yan fikirîn
Dijwar e.
Zarotiya te,
Evîn, heval û hogirê diya te, şêrê pîrika te
U hêviyên me... û hêviyên me ji me digirin Gulîzerê.

Serdilê,
Xwişka xwe, pîrika xwe, kalikê xwe yê kokim bihewîne,
Ji wan re bibêje ku
Diyarbekir, Silêmaniye,
Mehabad û Cizîre
Di şîne de ne.
Ji wan re bibêje ku
Ew mêrxas, ew jîr, ew bîrewer bû.

Ji wan re bibêje ku
Wî ji we hez dikir,
Ji te û xwişka te, ji diya te, ji kalik û pîrika te,
Ji meriv, heval û hogirên xwe,
Ji gel û welatê xwe hez dikir...

Serdilê,
Ez niha li pirtûkeke bavê te dinihêrim; Doza Kurdistan. Di çapkirina vê pirtûka hêja û tarîxî de alîkariya bavê te jî pir bû. Di pirtûkê de, şehîdên me yên neteweyî li pey hev, di nav rûpelan de, rêzbûyî ne. Şêx Seîd, Seyid Ebdulqadir, Xalidê Cibîrî, Yado Axa, Dr. Fuad Beg, Bavê Tûjo, Seyid Riza, Qadî Mihemed û gelekên din tê de ne... Ma tu dizanî, bavê te di bin sûretê Bavê Tûjo de çî nivîsiye?.. "Qehremanê mezin" ... Wî weha nivîsiye... Qehremanê mezin...
Serdilê, kezîzerê,
Bavê te hevalê qehremanên mezin bû...

[Sibat - 1984]

Perspektîfa kê ne Kurd û Kurdistanî bû?

Meqaleyek bi sernivîsa "Perspektîfa Kurd û Kurdistanî" bi navê Hesên Mizgîn di rojnama Armançê hejmarê 110'an de çap bû. Di maqala xwe de H. Mizgîn dixwaze hinek "asteng" û "problemên" li ber "perspektîfa Kurd û Kurdistanî" de heye munaqêşe bike. Di îddîa û îthamên xwe de H. Mizgîn gelekî bi pêş de diçe, xwe û hemû Kurdan û hêzên Kurd û xebata wan a heta îro, bi bê perspektîfa Kurd û Kurdistanî sêdard dibe. Îddîa û îtham gelek mezin in, divê jê re bersiv vere dayîn. Li alî din, divê van îddîana bîn îspat kirin. Divê dîtina H. Mizgîn bi argument bê eşkerekirin, an jî pûç kirin.

Berî ku ez li ser îddîayên H. Mizgîn bisekinim, dixwazim ji aliyê metod ve xalekê zelal bikim.

H. Mizgîn di nivîsa xwe de li ser navê hemû Kurdan dipeyve dibêje ku: "şexsiyeta me ya siyasî ji Kurdbûn û Kurdistanî pêk nehatibû."

Nizanim heqê H. Mizgîn heye ku, li ser navê hemû Kurdan dipeyve û hemû Kurdan bi bê "şexsiyeta Kurdbûn û Kurdistanî" îtham bike? "Ma ewê hîn baştir nebûya ku H. Mizgîn di şûna ku bigota "em" bigota "ez"? Dema ku H. Mizgîn li ser navê "me" Kurdan dipeyve, xwe dixwe reweş gelek zahmet ku wê nikaribe bersiva xwe bide û xwe biparêze.

H. Mizgîn di destpêka nivîsa xwe de wiha dibêje: "Em Kurd jî ketin ber vê lehiyê û me jî bi awakî dilgermî bawerîya xwe bi perestrojka û glasnostê re beyan kir."

Kurdan li ku derê, kînga û çawa bawerîya xwe bi perestrojka û glasnostê re beyan kirin, ez nizanim beyanek wiha ne kesî xwendiyê û ne jî ditiye. Tişteki ez dizanim; li ser perestrojka û

glasnostê gelek munaqêşe di nav me Kurdan de dibin û di van munaqêşan de, hinek li gel hinek jî ne li gel perestrojka û glasnostê ne. Şûna ku H. Mizgîn bigota "me" bigota "min" bawerîya xwe beyan kiriye wê hîn baştir û rastir bûya. Wê demê kesî jî nikaribû îfraz bikira.

Di nivîsa H. Mizgîn de gelek gotin û îtham hene ku; dema merov bixwaze meriv dikare gelek dîr û dirêj li ser bisekinin û gelek tiştan bibêje. Lê ezê tenê li ser çend îddîayan bisekinim ku; bingeha gotara Hesên Mizgîn pêk tîne.

H. Mizgîn weha dibêje: "şexsiyeta me ya siyasî ji Kurdbûn û Kurdistanî pêk nehatibû" û dom dibe; "carekê em siyaseta ji devê "sosyalist" û komunîst" gelê serdest hîn dibûn. Parastina sistema sosyalist û lêkolîna pirs û pirsêgirêkan sosyalîzmê û komunîzmê mecal ji me re nehiştibû..."

Berî her tiştî H. Mizgîn xwe jî birve dibe ku, hemû Kurd ne sosyalist bûn. Ji bo hêzên ku ne sosyalist bûn ew "problemên" ku H. Mizgîn bahs dikin çet tunebûn. Hêzên welatperwer çawa dikare bi rexna "şexsiyeta me ya siyasî ji Kurdbûn û ji Kurdistanî" pêk nehatibû bîn îtham kirin ku îddîaya H. Mizgîn ji bo hêzên welat-parêzên Kurd, ne rast e û ne di cî de ye. Dema ku H. Mizgîn divê "em", hêzên welatparêz ne tîda ne.

Dimîne hêzên sosyalist û Marksîs ên Kurdistanê. Hemû sosyalist ên Kurd wek tê zanîn -lê H. Mizgîn jî birve kiriye- hemû ne sovyetîk bûn û sistema sosyalist jî nedi parastin! Hêzên ne li ser Çîn û Sovyetê di nav "me" Kurdan de hebûn.

Nuha hevalek ji wan hêzan jî H. Mizgîn re bibêje: "kekê min, dema ku te Sovyet, sistema

sosyalist diparast, em li dij Sovyet û sistema sosyalist bûn. Tiştê ku me ne parastiyê û em ne pê re bûne çawa dikare rê li ber şexsiyeta me ya Kurdîyê bigre? Bawer dikim ku; bersiva H. Mizgîn wê gelekî înteressant be! Xalên ku ez dixwazim zelal bikim ew e ku hemû hêzên sosyalist "me" ne wekî ku H. Mizgîn bahs dibe bûne.

Dawiya dawî hêzên Kurd ên Sovyetîk dimîne û H. Mizgîn jî ji van hevalan yek e. Şûna ku H. Mizgîn xwe û hevalên xwe bi van îddîayên xwe îtham bike, ew jî bo herkesî van îddîayan tîne. Hêzên Kurdên Sovyetîk Sovyet sistema sosyalist parastin rast e.. Lê ew nikare manê ku şexsiyeta van hêzan bê perspektîfa Kurd û Kurdistanê bûn.

Van hêzan jî bo Kurd û Kurdistanê partî ava kirin, li hemû bajarên Kurdistanê komele ava kirin. Kovarên siyasî û kulturî derxistin. Endam û sêmpatîzanên van grûban hatin kuştin, îşkence dînan, ketin zindanan mecbûr man welatên xwe terk kirin. Hemû tiştên xwe jî bo perspektîfa Kurd û Kurdistanî tayîn kirin, ne jî bo Sovyet yan jî sistema sosyalist. Li dij sistema emperyalîst-kapîtalîst parastina sosyalîzmê divê îro nebe sê! Ev îddîa û îthamên ji bo hêzên sosyalist ên Kurd him ne rast in him jî neheqiyê. Lê îro jî sosyalîzmê re jî hêzên sosyalist re xirab hatiye. Dema ku em dixwazin çewtî û kêmasiyên xwe munaqêşe bikin û jê dersan derxin, divê em tiştên xwe yê baş jî înkâr nekin. Hêzên Kurd ên sosyalist jî bo parastina Kurd û Kurdistanî xebatek bêhempa kirine ku îro jî gelek însan di tesîra xebata wan de ne. Îro li Kurdistanê dîsa ji bo serxwebûn û azadiya gelê Kurd ên ku serî dikşînin sosyalîstên Kurd

in. Him li dervayê welat û him jî hundirê welat gelek kovar, pirtûk ji aliyê sosyalîstên Kurd ve derdikevin.

Ji ber hinek çewtî, kêmasî û şaşîyan divê bi rehetî em nikaribin bibêjin ku; şexsiyeta me ya siyasî ne Kurd bûn û Kurdistanîyê pêknehatibû". Ew xebat ku min bi kurtayî bahs kir; ji bo gelê Kurd û şexsiyeta siyasî ya Kurdbûn û Kurdistanîyê nebe gelo xebatek çawa kare bibe ji bo şexsiyeta siyasî ya Kurdbûn û Kurdistanîyê!

H. Mizgîn li vir jî nasekine û dom dibe, dixwaze ji sedemên şaşîyên "me" Kurdan re îzahê bîne û dibêje: "carekê em siyaseta ji devê "sosyalist" û "komunîst" gelê serdest hîn dibûn".

H. Mizgîn di qelemekê de hemû "çewtî" yê "me" Kurdan kir hustiyê "sosyalist" û "komunîst" ên gelê serdest. Ji ber ku "em siyaseta ji van fêr dibin" Ez bawer dikim ku, an nuha uzerê H. Mizgîn ji kebehata wî mestir bû! Hevalekî "sosyalist" ya jî "komunîst" jî gelê serdest pê bihesse ku H. Mizgîn "çewtî" û "kêmasiyên" Kurdan bi wî awayî analiz û îzah dibe; "Wê nebêje kekê min, Xwedê hîs û aqil daye ku, tu siyaseta nizanî, lê radibî li ser navê neteweyekî politîkayê dimeşîni û dema ku tu bi ser nakevî radibî me sêdard dikî, ma weha dibê?" Bersiva H. Mizgîn wê çawa be? ez gelekî meraq dikim.

Netîce H. Mizgîn Kurdan nezan û ji politîkayê fehm nakin nîşan dide. Îro wer xuya dibe ku H. Mizgîn "em" bi xwe hay bûne, kêmasî û çewtîyên xwe "me" tespît kiriye. Lê xususa ku ez meraq dikim piştî deh salan şûn ve "em" e xebata xwe ya îro û politîka xwe tîxin hustiyê hineka an na? Emê dîsa bibêjin: Berî nuha bi deh salan politîkayê, wek mîsal, em ji Ewropîyan fêr dibûn.

Di nivîsa xwe de H. Mizgîn xalek din jî ji bo "me" Kurdan hewce dibîne û dibêje "Stalînîzm", "Lênînîzm" û "Mark-

sîzm" dibê ji bo Kurdan nebe babeta herî girîng". Ew jî bo çî ji bo me Kurdan ne girîng e, H. Mizgîn îzah nake! Na hêzên Kurdan de dîtînen çihê çihê ji "Sosyalist" heta "Îslamî" H. Mizgîn normal dibîne. Eger wera be, divê sosyalîstên Kurd ji bo çî wê munaqêşan pirsên sosyalîzmê nekin? Stalînîzm ji bo çî wê li ser munaqêşe nebe? Ku Stalînîzm fenomenek gelek muhîm e di tevgera sosyalist de. Hevdu kuştin, tasfîyekirin, bi ajanî îlan-kin, gerek em ji bîr nekin ku, bi Stalîn ketiye nav hêzên sosyalist. Ezê li ser xalek din jî bisekinim û nivîsa xwe dawî binim. H. Mizgîn dibêje ku; "dema ku perspektîfa mirov "Kurd û Kurdistanî" be li hember yekîtiyê, cepha û hevkarîyê tu bend namîne". Di tevaiyîya nivîsa H. Mizgîn de Kurd bi bê perspektîfa Kurd û Kurdistanîyê tînen îtham kirin. Ji bo ku Kurd ne xwediyê perspektîfê wiha ne, hemû karê me jî bo mesleheta gelên din bûye, dibêje. Min jî xwest biqasî ku ji min hat, îzeh bikim ku Kurdan li ser navên Kurdayetiyê partî, komele danîne, kovar, pirtûk derxistine, xwediyê perspektîfa Kurd û Kurdistanî bûne.

Kurdan tevî hemû kêmasî û şaşîyên xwe gelek karê baş û hêja kirine. Hemû hevkarî, cephe li ser vê perspektîfa Kurd û Kurdistanê ava kirine. Cara pêşîn sê hêzên Kurd li Kurdistanê Tirkîyê li ser navê UDG di sala 1979'an de hevkarîyek avakirin. Paşê gelek hêzên Kurdî sala 1982'an de dest bi xebata "Hevkarîyê" kirin. Wek xuya dibe, hemû xebat ji bo Kurd û Kurdistanê û şexsiyeta me ya siyasî ji bo Kurdbûnê bû. Ev hersên mîsal jî nîşan didin ku; perspektîfa Kurd û Kurdistanîyê di hemû kar û barên me de wek stêrkekê ji me re pêşengiyê dibe. Ev xebatên yekîtiyê û hevkarîyê carekê din îddîayên H. Mizgîn pûç dikin.

Alîkariya Uppsalayê ji şerê Seddam ê gazê re?

Lêkolinerên Iraqê "Êdî" Nahêlin Uppsalayê

Zanîngeha Uppsalayê biwergirtina lêkolinerên vevendî alîkariya zanariya kimyewî didan şerê Iraqê.

Profesor Lennart Deckner a fakülteta BMC (Fakülteta Kimyê û Biyolojîyê) li zanîngeha Uppsalayê bi xwe van gotinan dibêje:

Divê em xwendevanên iraqî wernegirin Înstîtuta toksolojîyê. Ez li dijî vê durûtiyê derketim û ev xeterekî girîng e ku ew vî zaniyariyê li vî derê jî me bistînin û ji bo destxistina gazên şer vî zaniyariyê bikaribin, bikar binin.

Di destpêka salên 1980'î de ji bo xwendina zanariya toksikolojîyê çar lêkolinerên vevendî ji

Iraqê hatin bajarê Uppsalayê. Ji vana du kesan di bin dabeşnêriya profesor Lennart Deckner de di navbêna salên 1985-1987 an de doktoranta xwe çêkirin. Profesor Lennart Deckner wiha dibêje; Wê çaxê tu sedemekî me yê taybetî tune bû ku em bi wan bawer nekin û ku wê ev kesana vî zaniyariya xwe di rewşa şer de bi kar binin. Mebesta me ew bû ku ku dewlata Iraqê ji bo xwendina van çar xwendevanan pere bide me. Lê paşê xuya kir ku tu mafekî me yê huqûqî tune bû ku em vî daxwaziya peran ji hikûmeta Iraqê bikin.


Ji wan lêkolineran yekî li ser TCDD ê xwendina xwe dikir, ev jahreke ku ji bo hawirdorê ye û tê de diyoksîn heye. Li gor zanistîya FOA (Mêcên Lêkolînê ên

Berxwedanê) ev madeya diyoksîn di şerê Wiyetnamê de hatiye bi kar anîn.

Yek ji wan xwendevanên iraqî jî li ser jahra civayê û çawa alkhol tesîrê li ser vî jahra civayê dibe, lêkolîna xwe dikir. Lêkolinerê sêmin jî doktora xwe, li ser meriv çawa dikare bi gazê însan di xew re ke, dikir. Çaremîn jî di warê kuştina heşaretan de xebata xwe çê dikir.

Di Bihara 1988 an de Iraqê êriş bir ser bajarê Helebçê, bi hezaran mirovên Kurd bi gaza xerdelê hatin kuştin. Li ser vî bûyerê deh profesor û bi sedan mamostên fakültetên kimyê û dermên li zanîngeha Uppsalayê nameyeke protestoyê ji bo hikûmeta Iraqê şandin.

Ev nameya protestoyê teslîmî



Profesor Lennart Deckner a fakülteta BMC (Fakülteta Kimyê û Biyolojîyê) dibêje: "Divê em xwendevanên iraqî wernegirin Înstîtuta toksolojîyê"

konsolosê Iraqê Sadîk Alî Saban kirin û bi girîngî jî li ser rawestiyana ku" di bin kîjan rewşê de dibe, divê ji bo qirkirina mirovan madeyên kimyewî neyê bi kar anîn".

Konsolosê Iraqê bi giştî bi

karanîna madeyê kimyewî li dijî Kurdan înkâr kir. Di wê demê de, di nexweşxana Akademîskayê a li bajarê Uppsalayê de birîndarên ji şerê Iraq-Iranê dihatin tedawî kirin.

Dûmahik: r. 11

Lêkolîn

Alfabêta Kurdî

Rizgar Baran

Nivîsara berêz Zagrosê Hajo ya di hejmara Armançê ya 109'an de çap bû, pêwîstî û girîngiya munaqeseyên li ser elfabeya Kurdî yê bi awakî zanistî careke din anî ber çavan. Di destpêka nivîsara xwe de ez ji berêz Zagrosê Hajo re sipas dikim û hêviya domdariya vê munaqesê dikim.

Min jî li ser Kurdî (zaravê Kurmancî) hin lêkolîn û hiljimêr (statîstîk) hene. Encamên van xebatîna, hin pêşniyarên berêz Zagrosê Hajo rast derdixin, bes ji bo hinan domdariya munaqesê û lêkolînên kwîrtîr pêwîst dikin. Di derheqê "H, E û X" de, dîtina min jî ew e ku; van tîpîna/dengina di Kurdî de pir kêr in, di gelek nivîsaran de peyde nabin û pevguhertina van dengina bi dengên E, H û X re nabe sedemê tu tevliheviyê, ji ber vê yekê jî meriv kare wan redundance bihesibîne. (Redundance bêjeyeke Îngîlîzî ye û bi wateya (maneya) zêdetî, nepêwîstbûn an hewcenebûnê tê bi kar anin). Diyar e ku neqandina tiştên zêde û tiştên hewce an pêwîst lêkolîn û hijîmarên kwîr û hevkarîya zimanzanan divê. Bes heta ku em bigihêjin wê qonaxê, divê em pêşniyarên xwe yê kesîn bînin holê, da ku ji xebatên mezintir re, bîngehek û ji tune de haya me ji hevdu hebe ku ji anîha de qasî ku dibe em nêzikî hev bibin.

Bikaranîna tîpa **K** dewsa **Q**, bi dîtina min karê me hêsantir nake, diwartir dike. Sedemên vêya:

1) ku wanî bêkirin ew ê **K** ji bo sê dengên **k**, **k'** ya hişk û **q** û ev yekê di zimanekî phonetic (deng-tîp) de diwar e.

2) Meriv dengên ji bo xweşbûn wan bi kar nîne, bes ji bo pêwîstiya wan bi kar tîne û ev jî ne li gor daxwazê meriv e, di pêvajoya dîroka zimên de ew bi awayekî xweristî pêk tê.

3) Ew deng di cihê xwe de xweş e, ji ber ku pirçar bûyerên xweristî nîşan dike û ew tiştina bi wî dengî xweştir tê zimên; bo mînak: **qajqaj**, **qajin**, **qapqap** (takunye), **qarin**, **qarqar**, **qîrîn** hwd. 4)

Li gor hin lêkolînên min bikaranîna **vî** dengî/vê tîpê wek di bêjeyekê de tîpa yekem/pêşîn, ji bikaranîna gelek dengên din pirtir e. Bo mînak: di serê bêjeyan de ji **C, Ç, E, Ê, F, J, O, U, V, W** pirtir tê bi kar anîn û ev yekê nîşan dike ku ev dengê Kurdî yê kevnare ye û di zimên de cihê xwe yê taybetî û xweristî heye (min li vir hiljimara van tîpana pêwîst nedît, çavlêgerandineke ferhengên Kurdî vê rastiyê bi hêsantîr eşkere dike). Ji ber van sedeman, bi dîtina min dengê **Q** di zimanê me de ne zêde ye, hewce ye û xweş e.

Pirsa dengên "cêwî", bi nêrîna min pirseke girîng e û lêkolîn û munaqesên kwîr û dirêj dixwaze. Ji ber ku ez bi zaravê Soranî (Kurmancî Xwarû) nizanin û lêkolînên min li ser tune (ev kêmasiyek e), di derheqê **L** de nikarim tiştêkî bibêjim. Lê **Ç, K, P, R, T** di Kurdî de cihêkî girîng hene. Heta niha hin kesan ew wekî du dengên cêwî û hinan jî yek du dengên taybetî/serbixwe dîtî. Ez bi xwe gotina "cêwî" di cih de nabînim. Li vir jî ji bo ku karibim nêrînen xwe zelaltir binim zimên ezê van dengina

bikim du koman û heçî yê hişk niqteyekê "." deynim ser daku xwendevan karibin wan ji hev cuda bibînin. Carina cuda-kirin an jî jihevnanîn bûyeran zelaltir dike ku meriv karibe wan hêsantir bigihîne hev. Koma dengên "hişk" **ç, k, r, t (çûk, keç, penêr, rû, tîr)** û koma din jî **ç, k, p, r, t, (çay, kab, pisîng, dêr, tev)**. Îcar em kanin yekê yekê li ser van dengina bisekinin.

1. **r û r:** **r** wek di gelek zimanên din de tê bilêvkirin, bo mînak: Tirkî. **r** meriv kare bibêje **r'** ya gindêrkirî ye, ji ber ku ev deng bi gindêrkirina **r'** yê tê bilêvkirin. Sedema ku hinek nivîskar wê bi du **r'** yan (**rr**) dinivîsînin ev e. Di Kurdî de ev deng ku di pêşiya bêjeyan de be, her tim **r** ye ango gindêrkirî ye (**rê, reş, rû, rovî** hwd). Bes li dawîya bêjeyê wek tîpa dawîn an di navbeyna tîpên bêjeyê yê din de kare bi herdu awayan jî be. Û ev yekê ji bo kesên ku ji zikmakî hînî Kurdî nebûne tevlihevî û diwarîyan derdixe. Bes ji kesên ji zikmakî hînbûyî re dewlemendiya dengên tîne. Bo mînak: **ker** (eşek) û **ker** (sagir), **pir** (köprü) û **pir** (çok, much), **tîr** (osuruk) û **tîr** (daha), hwd.

2. **ç û ç:** **ç** wek bi Tirkî **ç** an bi Îngîlîzî **ch** di bêjeya *church* de ye. **ç** dengêkî di navbeyna du dengên bîngêhîn (**c** û **ç**) de ye. Ji dêvla meriv bibêje "cêwîya ç'yê meriv kare bibêje ç'ya hişk an ç'ya nerm, an jî dengêkî di navbeyna van herdu dengên de. **ç** û **ç** herdu jî him wek tîpa pêşîn, him wek tîpa dawîn û him jî di navbeyna tîpên din de tîpên bikaranîn û pevguhertina herdu dengên pirçaran ligel bilêvkirina wateya bêjeyan jî diguherîne û ji ber vê hindê jî kesên nezan re tevlihevî û diwarîyan derfîne. Bo mînak: **ço** (deh!) û **ço** (sopa, stick), **çil** (40) û **çil** (obur, greedy), **çilo** (çawa) û **çilo** (şaxên daran ên berhevkerî), hwd.

3. **k û k:** **k** wek bi Tirkî an Îngîlîzî **k** ye. Bes **k** dengêkî di navbeyna du dengên bîngêhîn (**k** û **g**) de ye. Meriv kare bibêje **k'** ya hişk. **k** û **k** jî wek **ç** û **ç** li herderê bêjeyan tîpên bi kar anîn û pevguhertina wan him wate û him jî bilêvkirina bêjeyan diguherîne. Bo mînak: **ka** (where, neredê) û **ka** (hay, saman), **ker** (donkey, eşek) û **ker** (deaf, sagir).

4. **p û p:** **p** wek bi Tirkî û Îngîlîzî **p** ye. **P** dengêkî di navbeyna **p** û **b** de ye, û meriv kare bibêje **p'** ya hişk. Herdu jî li herderê bêjeyan xuya dibin û pevguhertina wan carina ligel bilêvkirina bêjeyê wateya wê jî diguherîne. Bo mînak: **par** (share, hisse, pehr) û **par** (last year, geçen sene). Di dawîya bêjeyan de bi piranî hişk tê bilêvkirin. Bo mînak: **gep**, **rep**, **ap**

5. **t û t:** **t** wek bi Tirkî û Îngîlîzî **t** tê bilêvkirin. **t** dengêkî

di navbeyna **t** û **d** de ye; herdu deng jî li herderê bêjeyan tîpên bi kar anîn û pevguhertina wan ligel bilêvkirine carina wateyê jî diguherîne. Bo mînak: **ta** (nexweşî) û **ta** (thread, iplik), **tu** (none, hiç) û **tu** (you, sen), **tû** (xwezî) û **tû** (mulberry, dut), hwd.

Encamên lêkolînek biçûk li ser nivîsarek ji 1700 tîpan pêkhatî wilo bûn: ji 16 ç'yan 4 ç (hişk) û 12 ç, ji 45 k'yan 36 k (hişk) û 9 k, ji 12 p'yan 6 p (hişk) 6 p, ji 55 r'yan 21 r gindêrkirî û 34 r, ji 44 t'yan 32 t (hişk) û 12 t. Ev yekê diyar dike ku ji dengên "cêwî" tu jî ne pir kêr in ku meriv bibêje dewsa tunebûna wan xuya nabe.

Ez li Londonê li xwendegheke belediyeke dersên Kurmancî bi tîpên Latînî didim. Sala pêşîn min ev tîpên li jor serniqtekirî cihê cihê (cuda cuda) nedan û min xwest ku xwendekarên min bi bilêvkirina bêjeyan hînî wan dengên jî bibin. Pir diwarî dikîşandin û wek mînakên li jor tim ew tevlihev dikirin. Sala duyem, di destpêka elfabê de, ez li ser dengên "cêwî" cuda cuda sekinim û min niqte "." bi kar anî. Piştî çend mehan min niqte rakir û ji wan xwest ku ji bilêvkirina bêjeyan hînî wan dengina bibin; min berhemên çêtir stendî. Îcar ku em werin ser pirsê ku ev dengên "cêwî" di zimên de "redundance" in an na, ji bo wan tîpên an nîşanên taybetî divê yan na, bi dîtina min;

1) Ev dengina ne "redundance" in, di zimên de him di warê dengên û him jî di warê wateyan de cihên wan hene û hejmara wan ne kêr e. Hebûna wan ji bo dewlemendiya zimên pêwîst e û tunebûna wan wê tevliheviyan bîne.

2) Ji bo van dengina tîpîne taybetî ne pêwîst e; elfabeya berêz **Celadet Bedirxan** tîra vî zimanî dike û 31 tîp bes in. Bes divê em van rastîna jî bidin ber çavan: piraniya Kurdan li Kurdistana Bakur in û li wir Kurdî bi tu navgînen bihîstyar (radyo, TV hwd) nayê bi kar anîn; li xwendegehan tu mamoste dersên Kurdî nadin; axaftina Kurdî bi xwe jî muşkule ye û her ku diçe ji zikmakî hînbûna Kurdî kêr dibe; Kurdistana çarperçekirî ye û Kurdên perçekî dengê yê perçê din nabihîzin; em gelek bêjeyên kevn û hemû bêjeyên nû ji kovar û pirtûkan hîn dibin û nizanin tîpên cêwî yê di van bêjena de wê bi çi awayî bînin bilêvkirin; bi sed hezaran Kurd anîha bi Kurdî nizanin û ku hîn bibin divê ji pirtûkan hîn bibin. Ji bo van sedemên jorîn, bi dîtina min, ne di rojname, kovar an pirtûkan de bes di ferheng an ansîklopediyên de, divê ji bo tîpên "cêwî" yê hişk tîpên bilêvkirin û **r'** ya gindêrkirî (**r**) nîşaneke taybetî bî bikaranîn; meriv kare". "an"- "yekê deyne ser wan da ku xwendevan bizanibin

ew hişk an gindêrkirî tîpên bilêvkirin. Qasî ku min di kovara Kurmancî ya Enstîtuya Kurd ya Parisê de xwend, ji bo ferhengeke hemû zaravên Kurdî xebatek heye, ez bi bawer im ku karibin wê pirsê di wê ferhengê de çareser bikin ew ê alikariyeke mezin bigihînin xwendevanan.

Li ser pirsê tîpên bi kulik "A" (ê, î, û) û (ç, ş) bêkulik an bê niqte li binî bînin nivîsîn, ez bawer dikim ku bi komputerê bi fermîna "overstrike" (li ser (tîpa dawîn) binivîse !) û bi makîna nivîsînê (deqtilo) bi bi kar anîna "backspace key", ev pirs bi hêsantîr tê çareserkerin; an na ew ê tevlihevî û diwarî derkevin. Divê em ji bîr nekin ku piraniya Kurdan zimanê nivîskî nizanin û yê ku zanin jî pirê wan bi tîpên Latînî nizanin. Pêşniyarên berêz Zagrosê Hajo

yê li ser jimarkirin (**A-1, B-2**, hwd) bilêvkirin (**B** (bê), **F** (if), hwd) û navlêkirina (**A**- Alan, **B**- Bêrivan, hwd) tîpan, bi dîtina min jî, di cih de ne û divê di van warina de standardên me hebin, bes bilêvkirina gişa tîpên bîdeng bi alikariya tîpeke bîdeng yekê taybetî be, wê hêsantir be û tîpîbtîp gotin (spelling) wê çêtir be. Bo mînak: **B** (be), **C** (ce), **F** (fe), **S** (se), hwd. Di navlêkirina tîpan de jî ji bo tîpên cêwî yê hişk tîpên bilêvkirin jî navên taybetî divê, wek (**çerm**, **kwîr**, **penêr**, **tîrî** hwd), an na xwendekarên destpêkê yê di hînbûna van dengina de diwarîyê bibînin.

Bi hêviya ku em rojekê karibin bibêjin: Ev elfabe ya hemû Kurdan e.

"Alfabêta Kurdî"

Şahîne B. Soreklî

Bi vî kurtenivîsarê, min xwezt ez Birêz Zagrosê Hajo ji bo gotara wî ya balkêş li ser "Alfabêta Kurdî" (ARMANÇ: H. 109) pîroz bikim û ji ARMANÇê re spas bikim, ku ew ji xwendevanan re pêşkêş kir.

Zagros, di gotara xwe de gelek tiştên balkêş tîne ber çavan. Yek ji wan bikarhanîna tîpên **ê, î, û, ç, ş** ye. Bi rastî jî ev kumikên li ser hersê tîpên bi deng û niçikên di bin herdu tîpên bîdeng de gelek gelşan tînin holê, lê mixabin rakirina wan ji alfabêya Kurdî ne tiştêkî praktîkî ye. Rast e, merovekî ku Kurdiya wî baş be ê bikaribe bîyî bikarhanîna van tîpan jî bixwêne, lê nekarhanîna van tîpan ê xwendinê diwar bike, bi taybetî jî bo zarokên nû fêrî xwendinê dibin û biyaniyên xwe hînî zimanê Kurdî dikin.

Ji bo alfabêya Îngîlîzî çare ji mêj ve bo pirsê li jor hatiye dîtin:

Di alfabêya Kurdî de	Di alfabêya Îngîlîzî de
ê	ai
î	ee (şeweyên din jî hene)
û	oo (şeweyên din jî hene)
ç	ch
ş	sh

Wek li jor xuya ye alfabêya Îngîlîzî li şûna tîpêke Kurdî du tîpan bi kar tîne, bîyî ku hejmara tîpên alfabeyê bêtir bike. Merov dikare bi hêsantî çareyeke wisa ji bo nivîsa Kurdî jî bibîne, wek mînak: "**ee**" li şûna **ê**, "**ii**" li şûna **î**, "**oo**" li şûna **û**, "**ch**" li şûna **ç**, "**sh**" li şûna **ş** (û, wek di: min û te de, merov dikare wek "**u**" bihêle: min u te).

Bi şeweyeke wisa hejmara tîpên alfabêya Kurdî ê ji 31 tîpan dakeve 26'an, wek ya Îngîlîzî. Merov ê bikaribe daktîlo û kompûterên standard bo zimanê Kurdî bi kar bîne û şandina tîlêgraman ê nema diwarîyan bîne holê. Pêkan e, ku ji bo hinan nivîsandina van tîpan bi vî nolê wek tiştêkî nenormal xuya bike di destpêkê de, lê dirêj nake çavên wan ê fêrî vî şeweyê bibin. Ew teksta Kamuran Bedirxan, ya ku Zagrosê Hajo di gotara xwe de bi kar hanî ê wisa were nivîsandin:

"Gundee Me

Rohilat e. Ezman heedî bi rengen sor u zer dikene. Shivan bi pez u seyye xwe ve ji gund derdikeve. Gavan jî deweer dide hev u bi cholee ve diche. Deriyen xaniyan vedibin u gundîi dichin ser zeviyeen xwe. Zaro, ji ber ko dibistan girtiye ji xwe re digerin, derdikevin cholee, bee diguherin. Jin û kecheen gund dest bi karee mala xwe dikin. Hin ji kaniyee avee tiimin, hin nancee xwe dipeejin û hinek jîi beertiivaniyee dikin. Hinek ji wan teshiyece direecin, tevn û mafiran cheedikin. Di gund de her kes bi dilxweshî dixebite. Gundîi hemoo hez ji hev dikin, ew dizanin hemoo birayeen hev in û wek miroveen berberiya hev u din dikin."

Heye ku pêşneyariyên hîn baştir hebin. Rojnameyêke Kurdî dikare di derheqê vî yekê de pêşneyariyan bixwaze û wan pêşkêşê xwendevanan bike, ta ku pêşneyariya herî baştir tê dîtin, lê bi şertê ku hejmara tîpên alfabête nizim bibe, ne bilind û bi şertê ku daktîlo û kompûterên standard bikaribin ji bo nivîsandina zimanê Kurdî werin bikaranîn.

Bi bawerîya min, rakirina kumikan û niçikan ji bo hêsankirin û pêşvebirina nivîsa Kurdî zor grîng e û hêsantir e ku va guhertina nuha cih bigire, ji ber ku anuha tenê çend kovar û rojnameyên bi tîpên latînî li Ewropa tîyên weşandin. Heger ew li hev bikin, di demeke kurt de ev problêm ê ji holê rabe. Heger îroj çareyek neyê dîtin, sal bi sal guhertina alfabête ê diwartir bibe.

(Destpêk di hejmara buhurî de)

Avabûna "Azadî"yê

Robert Olson



İhsan Nûrî Paşa Serokê Serihildana Agriyê

Britanî bi dût û dirêjayî li ser rawestiyan ku tespît bikin ka gelo her wekî ku Tirkan di namên xwe yê şifrekirî(8) yê xapînok de îma dikirin, di nav bazdayiyên Beyt Şebabê de tu casûs(sixur) hene yan na. Di 1'ê Çileyayê Paşîn(January) û 7'ê Çileyayê Paşîn a 1925'an de istixbarata Tirk du namên tuhmê(ithamkirinê, sucdarkirinê) şandin bi niyeta ku wê tekeve destê istixbarata Britanî, tê de ev agahdarî jî hebûn ku xwedêgiravî İhsan Nûrî casûs (ê Tirkan n. A.) e. Britaniyan piştî deşifrekirina navan ev yek tespît kirin û ji nêz ve tehqîq kirin. Ewan name wek karekî bêkêr ê kontragahdariya Tirkan dîtî û piştguh kirin Kaptanê (yuzbaşî) Daira Xizmetên Taybetî(The Special Services Office-SSO) yê ku rapor nivîsî, gihast wê encamê ku îthamên ku li hember İhsan Nûrî dihatin kirin ji ber sê sedeman sexte bûn: Tirkan gelek caran namên wiha tuhmedariyê rêdikirin bi niyeta ku wê tekevin dest, wan ji bo ku zêdetir ber bi rastiyê ve xwiyabikin û bawer bi wan bê, name şifrekirî dişandin. Û Tirkan niyet dikirin ku çentê(torbê) postê di demek wiha de tekeve destê Britaniyan ku dema tehqîqê bûna li ser zabitên ku beşdarî Serihildana Beyt Şebabê bûbûn. Ma çima sebeb nehata çekirin ku Britanî zorê bidin İhsan Nûrî di demek wiha de ku ew bi xwe nikarin? (Binêre: Zêdeyî V ji bo nama istixbarata Tirk a ji bo İhsan Nûrî hatiye şandin ku li ber çavê Britaniyan wî wekî casûsekî bidin nişandin -Me ev zêdeyî di Armancê de çapnekiriye. Çimkî bi naveroka xwe tiştêk tê de tune, bes bi qesda xapandina Îngilîzan hatiye nivîsîn. n. A.)

Li gor Van Bruinessen û agahdariyên wî, Azadiyê Kongra xwe ya pêşîn di 1924'an de civandiye, lê tarîx ne diyar e (9). Şêx Seid ku serokê Serihildana 1925'an bû, serok û şêxê Nekşibendî bû. Ji alî

zewacê(jinaninê) de merivatiya wî bi Xalid Begê Cibî re hebû. Hemdemên wî iddia dikin ku millet-perwerekî dilsoz bûye. Ji ber ku tesîrek wî ya gelek mezin li ser eşîrên Zaza yê bakurê rojhilatê Diyarbekirê hebû, ji bo Kongrê hatibû vexwendin(dawetkirin).

Fermandarên Alayên Hemidî yê kevn ji di kongrê de beşdar bûn. Dixwiyê ku di heq serihildanê de ew, qasî Şêx Seid ne dilgerm û xwîngerm bûn, lê ew ji alî Şêx Seid bixwe hatibûn iqna kirin ku serihildan bivê nevê ye (zerûrî ye). Ev delilê, piştgirî û seroktiya zû ya Şêx e, ji bo serihildana plankirî. Kongra pêşîn a Azadiyê du biryarên girîng girtin: yek, biryar girt ku serihildanek giştî destpê bike û di wê wextê de îlana serxwebûnê bê kirin. Duda, wê biryar da ku alikariya xerîban(a ji derve) wê pêwîst be. Têkilî wê bi herduyan re jî, him bi Yekîtiya Sovyetan û him jî Britaniya Mezin re bèn danîn. Nehatibû gotin ku wê piştgiriya serihildanê bikin û nehatibû gotin ku wê li dijî jî rewestin. Dixwiyê ku Kurd hazîrbûn agirê serihildanê bi quweta xwe pêxin.

Van Bruinessen xwe dispêre wê yekê ku Kongra pêşîn a Azadiyê di 1924'an de hatiye lidar xistin. Lê girînge bê tespît kirin ka kîjan tarîxê hatiye li dar xistin, ji ber rola wê ya bi tesîr a li ser plankirina Serihildana Şêx Seid a Sibata 1925'an û ya serihildana Beyt Şebabê a şeva 3-4'ê Îlona 1924'an.

Kongrêk Tirk û Kurdan di destpêka Tebaxa (August) 1924'-an de pêk hat. Hê rasttir, Kongre li Diyarbekirê di 1'ê Tebaxê de hat vekirin(10). Di Kongra Diyarbekirê de hukûmeta Tirk, peyman da ku bifikire van her şeş dax-wazê Kurdan ji nuh ve bicîh bike" 1) divê idarek bi awayekî taybetî bihata danîn li wan herêmên ku piraniya wan Kurd in. 2) hukûmeta Tirk wê krediyekê ji Kurdan re peyda bikira

(mîqdara wê di dokumentan de nehatiye ferzkirin); 3) efuyek giştî de bihata derxistin ji bo wan Kurdên ku di zindanan de ne; 4) ji bo demek pênc salan li Kurdistanê eskeriya mecbûrî wê tunebûna; 5) Hukûmeta Tirk wê ji nuh ve qanûnên şerî danîna û ew malên ku ordiyê li welêt dest danibûn ser paşde bidana; û 6) ew zabitên ordiya Tirk û memûrên ku xerabiyên wan hatine tespît kirin wê ji cî û meqamên xwe yê li Kurdistanê bihatana rakirin. Di şûna bicîanîna van daxwazan ji alî Tirkan de, Kurdan wê piştgiriya mewqîf û taktîkên hukûmeta Tirk ên li ser pîrsa Musilê bikirana.

Mimkun e ku Kongra Azadiyê ya pêşîn piştî Kongra Tirk û Kurdan a ku di 1'ê Tebaxê de li Diyarbekirê hat bestin, civiya. Eger wiha be, wê bibe delil ku Kurd ne memnûn bûn, yan jî bêhêvî bûn ku hukûmeta Tirk peyman ku li Diyarbekir hatibû pêkanîn wê bicîh bîne. Di heftên piştî Kongra Diyarbekirê de, cardin serihildanek berfireh li Dêrsimê di nav eşîrên Koçgiri de destpê kiribû. Cevad Paşa; mufetişê ordiya Sivasê, bi selahiyetek mezin hatibû çekdarkirin, ku serihildanê bipelêxe. Dibe ku bersîva hukûmeta Tirk a li hember serihildanên Koçgiriye, bicîneanin yan rêlibergirtina peyman a Diyarbekirê be. Li alî din, dixuye ku niyetek hukûmeta Tirk tunebû ku şertên peyman a Diyarbekirê bicîh bîne.

Gelek serokên Kurdan ên ku di Kongra Diyarbekirê de civiyan, dikirabûn çî berî, çî jî piştî Kongra 1'ê Tebaxê bicivin? Eger Kongra Azadiyê berî Kongra Kurd û Tirkan a Diyarbekirê civiyabe, wê were wê manê ku, her wiha tu niyetek wan ku xwe bi peymanan wir ve girêdin tunebuye. Wê haya istixbarata Tirk ji vê hebe, loma mumkûn e ku Tirkan bangî civîna Diyarbekirê kirin û rûbirûyî hin daxwazên Kurdan bûn, ji bo ku zeman qezencbikin, bala serokên Kurdan bi derek din de bikin, wan aş bikin, hinekî piştgirî û alikariya leşkerî ya Kurdan qezenc bikin li hember Britaniyan li ser hududê Tirkiyê û Iraqê û rê li ber wê yekê bigrin ku alikariya Kurdan bigihîje Kurdên Koçgiriye. Tam mehek piştî xelasbûna Kongra Kurd û Tirk a li Diyarbekirê, hejmarek qasî 500 zabit û leşkerên Kurd, li Beyt Şebabê; qezak piçûk, qasî 20 km dûri Iraqê serihildan. Wek ku li jor hat bahskirin, serihildan ji alî İhsan Nûrî û zabitên li pey wî hatibû handan (tehrîkkirin). Li ser emrê Yusuf Ziya; endamekî serokê Azadiyê ji Bitlisê û milletwekiliyê kevn ê Meclîsa Mezin a Tirkiyê (TBMM)

Li gor zabitên Kurd en ku bazdabûn Musilê, serihildana Beyt Şebabê hatibû rakirin ji bo ku rê li ber wan planên Tirkan bèn girtin yê ku

Britanî bi dût û dirêjayî li ser rawestiyan ku tespît bikin ka gelo her wekî ku Tirkan di namên xwe yê şifrekirî(8) yê xapînok de îma dikirin, di nav bazdayiyên Beyt Şebabê de tu casûs(sixur) hene yan na. Di 1'ê Çileyayê Paşîn(January) û 7'ê Çileyayê Paşîn a 1925'an de istixbarata Tirk du namên tuhmê(ithamkirinê, sucdarkirinê) şandin bi niyeta ku wê tekeve destê istixbarata Britanî, tê de ev agahdarî jî hebûn ku xwedêgiravî İhsan Nûrî casûs (ê Tirkan n. A.) e. Britaniyan piştî deşifrekirina navan ev yek tespît kirin û ji nêz ve tehqîq kirin. Ewan name wek karekî bêkêr ê kontragahdariya Tirkan dîtî û piştguh kirin Kaptanê (yuzbaşî) Daira Xizmetên Taybetî(The Special Services Office-SSO) yê ku rapor nivîsî, gihast wê encamê ku îthamên ku li hember İhsan Nûrî dihatin kirin ji ber sê sedeman sexte bûn: Tirkan gelek caran namên wiha tuhmedariyê rêdikirin bi niyeta ku wê tekevin dest, wan ji bo ku zêdetir ber bi rastiyê ve xwiyabikin û bawer bi wan bê, name şifrekirî dişandin. Û Tirkan niyet dikirin ku çentê(torbê) postê di demek wiha de tekeve destê Britaniyan ku dema tehqîqê bûna li ser zabitên ku beşdarî Serihildana Beyt Şebabê bûbûn.


dixwestin êrişên Kurdan ji hev bixin û di eynî wextê de mewqûfên hêzên xwe xwestir bikin da bikaribin zixtê li ser hêzên Britanî yê Iraqê bikin, ku gelekên van hêzan şerker ên Asûrî û mufrezên Hindî bûn. Bi bicîhanîna vê planê Tirkan heft hedef dabûn pêş xwe; 1) Berî daketina berfê tahkîmkirina mewqîfên xwe yê ku ji niha de jî xurt bûn; 2) avakirina, cebirxanan, depoyan û çeperan; 3) destpêkirina çekirina riyay; 4) peydakirin û bikaranîna navbirekê di rêberiya eşîrên Kurd de ku wê têkilî û çûn û hatinê bi Şêx Mahmûd (Serokê Kurdên Iraqê) re danîna, gav bi gav kontrolkirina çiya û zozanên ku dadiketîna deşta Musilê; 5) piştî cibicîkirina hedefên jor, dagîrkirina herêmên Kerkûk û Silemaniyê ku li wir wê di mewqîfêkî gelek baş de bûna ku karibin Musilê têxin bin xeterê; 6) hazirikirina ji bo bidarxistina serihildanê li hember Britaniyan li nav eşîrên Kurd ji bakur jî bi hewardaxistina serihildanê li hember Britaniyan li nav eşîrên başûr ên Iraqê (bi vî karî, wê wan rê bidana ku eşîrên bakur gundên Xristiyanan(Filan) talan bikin. Pijkirina

Lêkolîn Lêkolîn



Serokê Cemûeta Azadiyê Xalidê Cibri

Kongra pêşîn a Azadiyê du biryarên girîng girtin: yek, biryar girt ku serihildanek giştî destpê bike û di wê wextê de îlana serxwebûnê bê kirin. Dudu, wê biryar da ku alikariya xerîban(a ji derve) wê pêwîst be. Têkilî wê bi herduyan re jî, him bi Yekîtiya Sovyetan û him jî Brîtaniya Mezin re bèn danîn. Nehatibû gotin ku wê piştgiriya serihildanê bikin û nehatibû gotin ku wê li dijî rewistin



Şêx Seid

hissên dîni û lidarxistina cihadekê li hember Brîtanîyan wê her wiha hevîyên alikariyekê ji bo Kurdan ji bal Brîtanîyan ve bixista û 7) xwe bingehkirin (tahkîmkirin) li Kerkûk û Silêmaniyê ji bo payîna encamên guftûgoyên li ser Mûsilê, di riya hebûna xwe re mecbûrkirina Cemiyeta Aqwan da biryarekê li gor daxwaza wan bide(30) Bi vî hawayî, iddia dikirin Kurdan ku Tirkan hevî dikirin ku hevîya Kurdan a ji bo xelasbûna ji bin zilma wan û ya serxwebûnê heta heta pûç bikin. Zabitên Kurd ên ku endamê Azadiyê bûn, ji istixbarata Brîtanî re gotin ku bi texmîna wan ji %50 yê zabit û leşkerên Ordiya Heftan a li Diyarbekirê Kurd in û ew hevîya piştgiriyekê ji wan dikin. Di ser re wan texmîn dikir ku sempatiya ji %20'ê zabit û leşkerên Tirk ji bo daxwazên Kurdan heye.

Bi piştgiriya siyasî ya wiha, serokên Azadiyê biryar dan ku serihildanekê li Beyt Şebabê di 3-4'ê îlona 1924'an de rakin. Serihildan xwedî sê hedefên esasi bû; rê li ber wê yekê bigrin ku eşîrên Kurd têkevin rewşek dijminayetiye bi Brîtanîyan re; rê li ber wê yekê bigrin ku Tirk hêzên xwe li zozanên Asûriyan bicivînin û manewiyeta ordiya Tirk zeif bixînin. Kurdan hevî dikirin ku bi biserxistina van hersê armancên diyarkirî li Beyt Şebabê, wê bala Tirkan bikişandana ser tevayîya herêma Bitlîs-Wan-Diyarbekirê û wê Tirk

mecbûr bikirana ku operasyonên xwe yên başûr rawestînin.

Qasî ku bûyerên dawiyê nîşan didin, serihildana Beyt Şebabê berî ku serokên Azadiyê karibin karûbar û muhawelên xwe bi yên serokên eşîran re kordîne bikin, destpê bû. Di encamê de eşîran bi xwe re nedîtî ku serî hildin. Fermandarê Tirk ê leşkerî yê garnizona Beyt Şebabê zû bi niyeta Serihildanê hesiya û pêre pêre dest bi girtina wan kesên ku şika beşdarbûne li ser wan bû, kir. Piraniya serokên ku me li jor navên wan da, mecbûr man bazdin Iraqê. Encama giştî ew bû ku sê bolugên(company) tabûrekê(battalion) û bolukekê ji taburek din bi girseyî ji ordiyê firar kirin. Temamiya wan 500 zabit û leşker bûn. Gava firar kiribûn sungûyên çar topên çiyayî di bin axê de veşartibûn û sêzdeh tivîngên otomatîk bi xwe re biribûn(31). Kurdan israr dikirin ku wext gelek girîng bû; hereketê divê di nav sê mehên pêşî de destpê bike; çimkî Tirkan bi tevayî hay ji merhele û rêxistina tevgera milî ya Kurd hebûn, bi taybetî ji Azadiyê. Kurd difikirin ku Tirk wê di çend heftan de hêzek mezin li hember wan kom bikin ji bo ku muxalefeta rêxistinî bipelêxin. Garnizon di mehên îlon û çiriya pêşîn de heta derecekê piçûk bûn û serihildanê berî ku taqwiye bigihîjin divê destpê bikira.

Zabitên istixbarata

Brîtanî, plan û hevîyên Kurdan wek awakî xeyalperest qîmetkirin, lê muhawelêyên zabitên(ên Kurd) ên li ser wazîfe nexwestina di ordiya Brîtanîya Iraqê de û di şûna wê de daxwaza wan a ku zûtîrîn wext biçin Kurdistanê; bakurê Iraqê ji bo berpakirina serihildanekê, tesîr li wan kiribû. Hevîya Brîtanîyan tunebû ku Kurd wê karibin serihildanek bi wî awayî berfireh li darxin qasî ku zabitên Kurd kiribûn. Her wiha bikêrhatina Azadiyê ku karibe nivê alayek Tirk rake serihildanê jî tesîr li wan kiribû. Di serihildana Beyt Şebabê de Brîtanîyan bihêzbûna siyasetek wilo dît ku sê dehsalên pişt re taqîb kirin. Gihîştin wê yekê ku Azadî wê bibe çekekî gelek bi hêz li hember Tirkan çî gava şer derkeve. Lê belê di wextê aştîyê de jî wê bikêrhatî bûna. Bi dizî tîrsa ji teşwîqkirina nasyonalîzma Kurd, dinivîsi kaptanê (yuzbaşiyê) SSO'yê, kare faktorekî diplomatîk ê îhmalnekirî bê hesabkirin. Tîrsa ji nasyonalîzma Kurd qîmetek gelek di salên dawiyê bi hesêb girt de û li ser hesabê gelê Kurd li ser hidudên Iraqê gelekî bikêr hat. Agahdarên Kurd bi israrî tekrar dikirin ku Azadî li pişt tevgera wan e. Piştgiriya Seid Taha ya ji bo serihildana Iraqê, li bakurê hudûdê îşareta gelek serihildanên din bû. Eşkere bû ji bo wan muxaberatên Brîtanî û memûrên Brîtanî yên ku sempatiyek wan ji Kurdan re hebûn, ku muamelek camêrane ji

Kurdên Iraqê û Kurdên penaber re û teşwîqkirina hesasiyeta wan a mîletperwerî, ger di şertên praktik de bihatana tetbiqkirin "wê tekrar bi tekrar telafîya wê bihatana bidestxistin, siyasetek wiha wê bibûna berpeçûnek wiha ku li ser hudûdê cepha bakur û bakurê cepha rojhilat a sisyan a rex Îranê gelek (xelkek) dost peyda bikira û di diplomasiyê de û di şerekî muhtemel de wê çekekî li hember Tirkan tîxîstîfa destê hukûmeta Iraqê" (32). Di Serihildana Beyt Şebabê de, istixbarata Brîtanî a li Iraqê tarîfek lihevkerî ya siyasetekê gelek xweş dît ku Brîtanîya Mezin demekê meşand.

(Xelas)

Notên Binî

8- Her wekî, istixbarata Brîtanîyan rewşa kar û meslega Îhsan Nûrî bi saya çar Kurdên bi navûdeng ku wê wextê li Iraqê bûn kontrol kirin. Ji wexta ku ew di bin parastina(muhafaza) Brîtanî de bûn û li alikariya Brîtanî digeriyan ku di hukûmeta Anglo-Iraqî de wezîfe bigrin agahdariyên wan rast hatin qebûlkirin : Zeynal- Abdîn, sekreterê kevn ê Kurd Tealî Cemiyetî li Stenbolê; Salîh Zekî Beg, zabitê kurmay(staff) ê kevn di ordiya Tirk de; Mulazim Faikh(Faik), firarekî ji ordiya Tirk; û Mustafa Paşa(Mustafa Paşa Yamulkî ku Kemalîst û Îtîhadiyan navê Nemrut Mustafa Paşa lêkiribûn n. A) li Stenbolê serokê kevn ê diwana herbê di ordiya Tirk de di demên 1919-

21920'an de. Her çar kes jî difikirin ku ne mumkûn e ku Îhsan Nûrî û firarên din casûs bin. Binêre Air 23/436, 7'ê Sibata 1925. Kopya namên Tirkan dikare di raporên ku li jor hatin binavkirin de bèn dîtin. Di 8'ê Tebaxa(August) 1926'an de Brîtanîyan hemû namên Tirkan ên ku di çentê postê de hatibûn girtin deşîfre kirin. Air 23/436, 6'ê Tebaxa 1925, herwiha beyan û belavokên Tirk û Kurdan tevî tercuma wan tê de ne.

9) Agahdariyên bi tenê yên li ser vî kongrê di Van Bruinessen, Agha, Shaikh and State r. 377-378 de, xwe dispêrin malûmatên devkî. Min tu dokument di Public Record Office de nedîtî ku bahsa vî kongrê bikin. Ev kare bibe delîlê wê yekê ku Azadî di vesartina xebata xwe de jêhatî bû. Tê xwiyakirin ku haya Îstixbarata Tirk jê hebû. Malûmatên min li vir Van Bruinessen taqîb dikin.

10) FO 424/261, ji Henderson(Sefîrê Brîtanî yê li Tirkîyê) ji bo MacDonald(Wezîrê Derve yê Brîtanî); Air 5/556, r. 12 xwe dispêre wê yekê ku kongreyek din a Tirk û Kurdan li Cizîrê hat civandin.

11) Air 23/411, 8'ê Çiriya Paşîn (November) 1924

12) Air 5/556, 27'ê Çiriya Paşîn 1924.

13) y.n.d

Hevpeyvîn bi

Ebdulah Peşew re

Di hejmarê bê de

Çîrok

Qulingê Perşkestî

Perwîz Cîhanî

Danê payîzê bû. Surr û seqem hêdî hêdî li çiyayêd bilind êd Kurdistanê cîwar dibûn, û gul û çiçekêd mîrg û çîmenan cihê xwe didane pûş û pelaşan, xûs û qirafiyê dewsa xûnava ser belgên gula digirtin û surra sar li cihê hûlmebayê hênîk û bînveker, li ser dol û newal û gedûk û gebozan hukûmdarî dikir û deşt û çiya nav lekmê xwe, peyak û teterê wî ser li her dalde û dîrbe û tîjik û herdan dida û her gîyan li berek li hatina danê sar agadar dikir.

Çiyayê Agirî, bilind û serefrax li hember vizeviza surra sar a payîzê û gujîna reşebayê wek mîrxasekî dinyadîtî mîrmêrane rawestabû. Şelax û qamçiyê tund û dijwar ê bayê zordar êdî ber çava re nedihat. Êdî hind ba û bager dîtine û bakurofe buhûrandiye, dibêjî qatî fêr bûye, ba û bager jê re tiştêkî asayî û serde bîye. Her tenê bayê tund dikare hindek ji xûlî û xîza pêşîra Agirî ji cî bileqîne û pûş û pelaş û kol û tûmêd ku reh û rêçalê wan sist û pilposekî bûne, ji cî rake û li gel xwe bo layê dol û newalan bişiqitîne û ber bi deştê raqetîne. Por û pirça spî heta navtenga Agirî jorda hatiye û roj bi rojê pirça wî ya spî dirêjtir dibe. Ji dîr va tu dibêjî qey pîremêrek e ku rîdîna wî heta ser çokan daketiye. Pîremêr e, lê ne pîremêrekî çemiyayî û daketî, belkî kalekî bejinbilind û şûş û di hindav da hilkişiyaye. Ev pîremêrê dinyadîtî bînanî nobedarekî li raser deşta Aranê ra rawestayê û her alî xaka pak dipê û her layî di çav ra dike.

Çemê Erez lemelem û nermik - nermik bînanî biskek pirça lûl û badayî, nerm û hulû wekî baqek armûşê peng li nav milê Agirî ber bi pêşîr û dawa wî ya pan û berîn dişûlûke. Tu ku ji dîr va li pêşîra Agirî dîna xwe didî deştê, dibêjî qey tîremarekî birîndar e ku çivan dide xwe û ber bi hilemaran dixuşike.

Meriv di kû da dikeve deştê, wî alî vî alî qamûş û cegenê kiraxê Erez daye ber xwe. Di nav qamûşan de meriv li ber dengê teyr û tûyan kerr û gêj dibe. Ji bo demek kurt her tişt ji bîra meriv diçe û meriv li nav dengê baldaran nuqim dibe.

Payîzek derengî ye. Wext û dema koç û rêkoça teyrên koçer e. Wa ye deste deste û ref-refî bûne û qutîna wan e û karê koç û bara dikin. Refek quling li rex Erez, dîrî teyrêdî ber hev bûne û qije-qija wan e. Dibêjî qey karê xwe dikin ku ber bi germiyani herin û danê zivistanê li rex çemê Firat derbas kin. Qutîna pêşengê wana ye. Dibêjî qey bi qijîn û qutîna xwe gazî heval û hogir û dost û yara dike, daku kes di cî da nemîne û nebe xûrê hildir û dirinde û eluh û bazîyan. Dema ku mirov vî qelebalix û qûte-qûte dibîne, rêkoça Kurdên koçer dête bîra mirov. Evana ji rojên hilgêr û dagerrê li wê demê da ne. Serekzome zengilê lokê mezin ku

pêşikêşê qenterê hêştira ye, dixê stûyê wî. Bi zinge-zinga zengilê lok re, zome hemû pê dihesin û agadar dibûn ku roja barkirîne pê ra gihîştîye û divê karê xwe bikin û kes li dewsa waran nemîne. Pêşengê qulinga jî îro bi qûfîn û qijîna xwe li zengilê koçkirîne dide daku çî quling li dewsa waran nemînin û nebin xûrê dijîman.

Teze berê spêdê gewr bûbû ku refê qulinga bi hewa ket, pêşengê wan li pêşî ye û ref jî bînanî du werisan li dû ra bi hewa ketin û bîna sêniçikekî di pêşîra esman da nitilandin. Teze bi hewa ketibûn, ku eluhê nêçîrvan bînanî teterê mirinê û qasid û peyakê mergê bi ser bîna wan da peyda bû. Wekî gurekî ku bikeve nav keriyê pezê bê se û şivan, refê qulinga tarûmar kir. Çend kuşt û çend birîndar kir. Ref bînanî berata ji hev belav bû, her yek bi layekî da revîn û hay ji hev nebûn.

Yek ji wan qulingê birîndar pêşengê wan bû, ku her du baskên wî şkestibûn, lê pêşeng şîya xwe ji nav lekmê eluh rizgar ke û li nav cegenê rex Erez perjîne bigre û xwe veşêre. Tirpe-tirpa dilê wî bû. Seranserê rojê ji tîrsa nikarî serê xwe ji nav pûş û pelaşê cegen derêxe. Dilê wî dilerizî û çokê wî diricifî, bi her xişînekê ra xwe dilemisande erdê û xwe diteland û perjîn digirt. Heta bereberî rojava nekarî serê xwe derêxe derve.

Hewa sar bû. Wextê rojava bû. Tav bînanî nexoşekî zer û zerhemî û pûtbûyî bê tav û hêz, dalqîyayî-dalqîyayî ber bi çiyayê rojava dişiqitî. Sîperêd çîya berebere dirêj û dirêjtir dibûn. Hêdî hêdî tarîfî diketê erdê.

Cegenê rex Erez cî bi çîyan teng û sêyrek e. Erdê wî lilek zeliqok e ku bînanî benîştê qanokî bi her tiştî ve dizeliqî.

Surra êvarê dest pê bûye. Bayekî sar dest bi vizîne kiriye. Heyveron e û hewa dar bîneya heyvê li nav ava Erez diçilvile. Ji dîr ve tu dibêjî qey devdasek teze zax kiriye ku bo cara yekê li jêr hesan derketiye û dibirîqe. Dewsa lingê dir deban yên ku li ser lîla rex Erez mane, tîjî av bûne û li ber heyveronê jî dîr va bînanî estêrika diçilvilin. Eger meriv ji dîr ve dîna xwe bide rex Erez, merivê bêje qey rex Erez estêrbaran kirine.

Pêşengê birîndar li nav cegen ketiye, xwîn li baskê wî dinuqite û di ser lîla rex Erez ra bînanî qeytanek gevez û gircî-gircî û badayî di nav qetê qamûşan ra ber bi avê dişûlûke. Mirov dibêje qey ew bi wê qeytana gevez di nav cegen da tewl dane û bi erdê ve dirûne, ku neşê ji cî rabe. Per û baskên wî giran bûne û giraniyê li laşê wî dikin. Laşê wî tevîzî ye û dikizkize. Bi tarîfîya hewayê ra ji cî leqiya. Lingêd wî req bûbûn û tewzî tê ra diçûn. Dema ku ji cî hilqedimî, ser serê xwe ji jor da kete nav lîla zeliqok. Lîl bi per û baskê wê ve zeliqî. Nigê wî di lîlê de çik dibûn. Gava ku gavek davêt, gava wî ya di nav lîl û qurê

de gîr dikir û bi zorê lingê xwe ji nav lîlê dideranî. Hind bê hemdê xwe per û bask li hev dabûn û xwe çirçirandibû, ku ji wê lîlê rizgar be, perêd wî ye nermik û gewrik belavî ser lîlê bûbûn.

Her perekî wî ye nerm û nol bînanî kullilkekê ku hatibe pêpez kirin, di herî û qurê de çik bûbûn. Tê digot qey pê perêd wî baxçeyekî zaroka ye, destkir çêkirine. Dewsa pencê wî li ser heriyê şixil û bineyêd cûr bi cûr netilandibû. Hind xûn jê çûbû, êdî hêz û taw di çûkê wî de nemabûn, serê wî leq dibû û li ser bedenê nedisekinî. Çaqên wî tarî bûbûn û bê hemdî xwe dihênîjî û hiş ve diçû. Rojên havînê danî bîra xwe. Rojên ku di gel dost û hevala li ber tava germ û sincirî, li ser ava hinke Erez somekarî dikirin û her gava dilê wan dixwast, singê esmana bi per û baskên xwe diqelaştin. Li van bîr û hizra da bû ku dilê wî xwast dîsa bînanî berê firqaza bide xwe û li ser singê esmanê şîm û geş, geşt û gera lêde. Lê belê dema ku xwast firqazê bide xwe, li ser serê xwe di lîlê de çik bû. Li nav lîlê gevizî, per û baskêd wî tev bûn herî. Bi zorê şîya li ser piya raweste. Qet rengê çî baldaran nedida. Te digot qey seyek e ku seyan ew di nav qorê de gevaztine.

Hêdî hêdî bîrsîbûnê jî zor didayê û taw û hêza wî heçê mabû jî, jê distand. Birîna wî dişewitî û deşîya û digelizî.

Bayekî sar dihat, qamûşê rex Erezê heta navtengê li pêşber bayê ditewiyay û xwar û mîl dibûn. Te digot qey serê xwe ji bayê rexwar dikir, bayê li avê dida û pêlêd biçûk li ser avê çêdikir, lê ew bînanî barane yek jî ber çavê quling re nedihatî. Her li bîr û hizra baskê xwe ye şkestî û refê xwe ye bîjîqî da bû. Nizanî ka çî bûye û çî qewimiyê? Çî hatiye serê hevalên wî? Gelo hevalêd wî ye mayî çûn, man, yan ewane jî bi çengê eluhê xwînrej letletî bûne? Bîr û hizrêd aloz ew nav hev de girtin. Heyiv jî hêdî hêdî li pişt çîyan da diqulibî. Te digot qey ew çîraya hejara jî naxwaze ronahîya xwe bide vî qulingê malwêran û lêqewimî. Piştî demeke kurt, tarîfîyeke reş û bilqetaw kete erdê. Xof û sawê di dilê quling de hêlûn kirin. Digerîya ku cihekî bi pûş û pelaş peyda bike, da ku midehekî kurt laşê xwe ye hecîrî li nav germ bike. Êdî xûnek wisa ji birîna wî nedihat. π hêdî hêdî xûna birîna wî diçikiya û hişk dibû. Lê sir û seqema bayê û êşa birîne, tîrsa tenêbûnê û reşatiya şevê û bîrsatiyê ew di nav hev de girtibûn û dilê wî dilerizandin. Sist û daketî û lemîşî ji nav cegen û qamûşan derket û guhdarî kir, çî deng û seda bi ber guhê wî neket. Her roj wan çaxa hevalêd wî di nav lîs û hêlûnan de cihên xwe germ dikirin û dibû qire-qira wan. Lê îşev dibêjî qey xwêşîya mirinê li rex Erez reşandine; çî deng û seda bi ber guhan nediket. Yan tirpana mergê û mirinê bi destê eluhê xwînrej ketiye nav mîrga jîna hevalan û kes zindî nehêlaye, yan jî hemûyan koç kirine û ji bilî wî çî kes nemaye. Bi cûreyî tîrse-tîrs li nav cegen şiqitî û ber bi lîsê xwe çû. Lê her çî kir û nekir neşîya lîsê xwe peyda bike. Serê wî gêj dibû. Ser û binî hev dibû. Nizanî kanî çî

bike û bi kû de here.... Wextekî şevê bi xwe hesiya ku hewa gelekî sar bûye, sir û seqemê li mejiyê hestiyê wî kar dikir. Dilerizî, diricifî; ewe sir û seqema spêdê bû. Piştî wê sirê bere-bere hewa germ bû, hêdî hêdî şefeq temîz bû. Spîfîya spêdê cihê reşatiya şevê tîjî kir û şevê pese û pûsê xwe rakir, roj di cihê wê de li ser textê hukûmdariyê rûnişt. Şev ret bû, lê çî şevêk reş û dirêj û sik û sar, tar û pîrsa û....

Tavê zeliqande nav cegen, qulingê perşkestî hêdî hêdî digehiştê armanç xwe ya yekşevî ku tîroşkê germetavê bû.

Tavê dinya tîjî kir. Dora Erez selewat girtibû. Qetek tenik bûz bînanî şuşeyek bîrqonek dora Erez dabû ber xwe. Cegen û qamûş li xûsek zîvîn da cûn bûbûn. Te digot qey hûrikê zîv li ser cegen reşandine. Tavê jî lê dabû û ew hûrkane li ber tîroşka tavê diçilvilin û rewneq diketê. Laşê quling di xûsê da ter bûbû. Her gava li ser avê û bin avê somekarî dikir, qet dilopek av jî li ser laşê wî nedima, lê niha laşê wî tevde qur û xûn bû. Xûs jî serde ketibû, bûbû serbarê barê giran. Zû li nav cegen seqitî û xwe da ber tavê. Tavê dayê û laşê wî hêdî hêdî germ bû. Bere-bere hişê wî hat serî. Çavên xwe vekirin û li dorûberê xwe nihêrî. Her der nas dikir. Lê hê jî tîrs û xofa eluh di dilê wî da mabû, bîra hevalan dikir, germiyay û Firat diketê bîrê. Nizanî ka dê çawa bi per û baskê şkestî û bi van lingên qor, vî rêka dîr û dirêj biqedîne. Divê ku zivistanê xwe bigihîne germiyane. Lê bi çî û çawa? Ew ku neşê bi piyan wan çol û çîyan pişt serê xwe re bihêlê û xwe bigihîne hevalan. Baskên wî şkestine û bi van zûyane çênabe û nacebire. Li van bîr û hizran de bû, ku xişînek bi ber guhê wî ket. Ji nişkêva dît ku va ye riviyek tele-tel ber bi wî tê. Pêş wê hindê da ku rivî xwe bigihîne wî, xwe li avê da û xwe gihande kûranîya Erez. Rivî ku ew nêçîra çivir li dest dabû, dora devê xwe alast û dêla xwe hejand û vî alî, wî alî rex çem re hat û çû. Dil hebû xwe li avê bide û bi dû quling bikeve. Lê dizanî ku Erez kûr e û nikare xwe bigihîne quling. Ji neçarî kor û poşman dêla xwe kire nav lingê xwe û ji wir dîr ket. Hê rivî gelekî dîr neketibû, ku çavê quling li hewa li reşekî ket. Bi lez xwe gihande nav cegenê xwe di nav pûş û pelaşan de veşart. Tirpe-tirpa dilê wî bû. Teze xwe di nav pûş û pelaşan de veşartibû ku gujîna eluhekî ser serê wî re derbas bû. Lê baş bû ku quling xwe veşartibû, xwe kiribû pûş û pelaş û li ber çavê eluh neket. Lê eluh ser hise-hisa ketibû, dest lê nedikêşa û li ser serê wî bûbû zivirok û dihat û diçû. Ger lê dida û hev dizivirî, piştî çendîna gera çû, tiştêk li ber çava neket. Bû gujîna baskên wî û ji wir bi dîr ket. Hê jî bêhna quling nehatibû ber, dilê wî tund lê dida. Dilê wî hebû li sebeda sînga da derketa derê. Bêhna wî çik bûbû. Piştî serê xwe ji nav pûş û pelaşan deramî û li dor û berê xwe mêze kir, çûn dilniya bû ku cihê tîrsê nemaye û çî tişt tune, ji nav cegen derket. Dîsa li ser avê ket. Bîrsîna dilê wî dixerifî. Çî tişt ber dimkê wî

neket. Ji birsa êşa birîne jî ji bîr kiribû. Hiç li serî da nemabû. Êdî ji çî tiştî neditirsîya. Li nav cegen derket û ber bi başûrê mit ma. Dilê wî dixwast hema wê gavê bi rêkeve. Emma çawan? Li vî bîr û hizrê da bû, ku dengê li ber guhê wî ket. Heta ku li dora xwe mêze kir dît ku çend zara ew kirne gîre û dora wî helbûqe girtine. Her yekî jî şivek di destê wan da ye. Êdî nizanî ka ye çî bike û çawan rizgar be. Kir ku firqazê bide xwe, lê zaroyekî kevkîyek avêtê û kevkî li lingê wî aliya û zarokan rikêfî ser kirin. Hindik mabû ku bikeve nav lepê zaran. Hindî taw û hêz di laşê wî da hebû, da lingê xwe li rex zarekî re ji helbûqe filitî û bi taw xwe avête nav avê. Bi lez ji lêwara Erez dîr ket. Ne destê biçûka digihîştê û ne jî kevkîyê wan hind dikîşand. Zaro bi teş û weş li rex avê rawestan û bi hesret û xazîk berê xwe dan quling.

Qulingê perşkestî laşê xwe ye bê hêz û taw siparte avê û di gel pêlêd nerm û leme Erez ber jêrda ket û li ber çavan wînda bû. Zaroya ku ew nêçîre li dest xwe dabûn, bi stûxwarî li rex Erez rûniştin û her yekî destexana xwe ji milê xwe vekirin û xerîkî xwarinê bûn. Dema ku xwarina xwe kuta kirin, kor û poşman û bi stûyê xwar patika xwe xwe-randin û cegen bi cî da hêlan û zivirîn.

Nêzikîya rojava bû ku quling bi zîkê bîrsî û şepirze bi ser lîsê xwe da zivirî. Çavên wî li rex lîs bi tiştêkî ketin. Pêşî we zanî ku davik û tele ye. Lê paşî berê xwe dayê û dît ku torbeyek tîjî birêjk e ku li dewsa biçûkan maye. Bêhna birêjka ew gêj kir. Çend nikil tê ra kirin. Genimê gergerî û xurmeya germiyane kete bîrê. Birêjkê şîr bûn. Gelekî lê xweş hat. Bi kel û bîn zîkekî tîr ji wan qelînekane xwar, lê qelînek gelek bûn, bi van zûyana ret nedibûn, êpece li ber ma. Bi xwarina wan qelînekane hindekî dilê wî germ bû û hate ser hemdê xwe. Paşê hindek pûş û pelaşê dî li ser lîsê xwe zêde kir û cihekî germ û nerm bo xwe saz kir. Çend roja li rex Erez ma. Xwar û vexwar, birînen wî kew girtin û qenc bûn. Êdî dişîya bifire. Lê ne wekî berê. Rojêk hate ser wê hizrê ku Erez di cî de bihêle û ber bi germiyane bi rê keve. Bi dilê tîjî kul û derd per li hev dan û bi hewa ket. Çîka êşa baskê wî ye şkestî dida kezêbê. Ew naweya ku berî demjimêrekê diçû, niha encax rojêk diçe. Ew jî bêhne-bêhn û bi zorî.

Piştî pênc, şeş rojan şeket û mandî xwe gihande zozanan. Zozan hemû bînanî hêkeke spî çîl û kever bû. Serên kevira jî reş nemabûn. Sir û seqema destpêka zivistanê li çîya û geliyan bêdadî dikir.

Şev bi ser da hat. Çî cih bi dest neket ku bi şev tê da biêwire. Ji neçarî li rex gundekî çîya li ser tîxek kayê venişt. Teze li ser kayê dadabû ku zarêd gund pê hesiyay û lê berev bûn. Bi kevîr û kerseng û kevkîya lê ba ketin.

Hindik mabû ku bikeve nav lep û çengê zarokan. Lê baş bû ku di wê demê da kalekî ridînsî li biçûka derket û li wan qîrîya û got:

Li Ceylanpinarê gundî mecbûrî barkirinê dibin



Di sala 1984'an de "Reforma Erd û Ziraatê" ya 174'an hat îptalkirin. Wezîrê Ziraatê Daristan û Karûbarê Gundan yê kevn, Husnu Dogan got ku li Ceylanpinarê li herêma Herducirciban qanûna di derbarê erdê xezîne û maliyê de ji bo tapûkirina li ser gundiyan hatiye qebûlkirin û derbasî jiyanê bûye. Li Wêranşarê 26 gund û li herêma Herducirciban jî 30 gund "herêma pîlot" hatin îlankirin. Piştî vê îlana hukûmetê hemû gundiyan bê erd û ji serê 30-40 salî virde ye ku li wê berriya bê av bê guman nuha av bi artîzêna derxistine û çandîni avî yezahmetî dikşandinê kêfxweş bûn, gotin "vaye emê jî bibin xwedî erd."

Bira gundî vê hêviyê bikin, lê hesabê hukûmetê tiştekî din bû. Ev hesab îro baştir eşkere dibe. Wek li gelek herêmên din, di nabêna Herducirciban de jî hukûmet ji gundiyan re dibêje "ya sîlehan bigrin û bibin milîsê dewletê, ya jî ji we re erd tune ye". Memurên reformê bi piranî hevalên Turkeş in - serokê faşîsta ye- û gundiyan mecbûr dikin ku rismên Turkeş li malên xwe bi darde kin. Ji 2886 malbatên cotkarên piçûk daxwaza ewraqên bê-qanûnî dikin. Pirsên siyasî û îstîxbaratê dikin. Li gel vê jî, ji Sidik Elkamiş, Halef Ahmed, Asvaf, Salih û Esat Azgin, Mehmet Ceylan, Alî Sal, Ahmet konuk, Amşa Çalışkan, Emine Unal, Nurî Var, İsmail Azgin, Huseyin Bellî, Vetha Tetik, Mehmet û Gazî Boga, Delya Yucel û 21 hevalên wan jî serê rojan ve ye ku nîgekî wan li Ruhayê û nîgekî wan jî li Anqerê ye, lê cardin jî pere nake, tiştê ji wan re tê gotin, "di vê merhelê de erd ji we re tune ye"

Gundî dibêjin, "a rast, divê ya em ji wan re îxbarçiyê bikin,

risim û rozetên Turkeş bigrin, ya jî ewê me bidin koç kirin." Û di dawiyê de dibêjin: Em bimirin jî em nabin muxbîr.

Bi vî hawî hukûmet dixwaze li herêmê hemû gundiyan bê erd bi darê zorê ji xwe re bike milîsên

gundan. Bê guman piranî vê bê şerefiyê qebûl nake, lê yê bikin jî pîrî hindik wê derkevin...

**Salihê Metîni
Wêranşar**

Wêranşar Di îmtîhana mamostetiyê de pirsên îmamtiyê

Li Wêranşarê di kadroya wekîltiya mamostetiyê de 30 ciyên vala hebûn. Ji bo vî karî 150 xortên mezûnê lîsê muracat kirin. Qaymeqam S. Saffet Karahisarli, ku demek berê ji Erûhê tayîni Wêranşarê bûbû jî kesên beşdar bi devkî pirsî, got: "Hûn dizanin nimêjê bikin? Rocî çiyê? Desmêj çawa tê girtin? Nimêja nivro çend rekate û nimêja miriya çawa tê kirin?" Li ser van pirsên qaymeqam, hemû xortên demokrat û pêşverû bi tevger û awirên xwe qaymeqam û pirsên wî protesto kirin û salona îmtîhanê terk kirin.

Dûre qaymeqam diyar kir ku sî(30) kesên hatine girtin wê ne tenê mamostetiyê, lê wê li gundan îmamtiyê jî bikin. Wî di axaftina xwe de bi awakî vekirî got: "Xortno, piştî qedandina dersan divê hûn dersên dîni bidin gundiyan. Ezê gelek kitêbên dîni ji we re bişînim. Hûnê li gundan bibin nunerên min."

Van gotinên qaymeqam ne bes di nav xortên beşdarî îmtîhanê de, di nav gelê qezê de jî bûn sebebê reaaksiyonek mezin.

**Salihê Metîni
Wêranşar**

Nama Vedat...

"Em li vir listîka televîzyonê ya Evet/Hayirê(erê/na yê) naleyizin. Min dibistan bi Tirkî xwendiyê, dibistana bilind bi Tirkî xelas kiriyê. Ez bi qesdî û zanebûn bi zimanê xwe yê zikmakî dipiyivim". Kurt birrî got "yê şik-jêkirî naxwaze îfadê bide" û derbasî îfada Ahmed bû. Min got ez îfade didim, lê hûn nagirin.

Ahmed û Mustafa jî gotin "Heta îfada hevalê me bi Kurdî neyê girtin em îfade nadin."

Awûqatan xwestin bipeyivin, lê heq nedan wan, wan jî protesto kir û ji salonê derketin. Tevî vê jî bê îfade em berdan.

Vedat Aydın

Hindik-Rindik

Bira zû bikira

Şivanek hebû, şivanê deh mîhan bû. Xwediyê pez jî merivekî çikûs bû. Cara bi rindikî ne kinc ji şivên re dikirî û ne jî xwarinek baş didayê. Ji ber vê yekê şivan ji malxuyê malê tije bûbû. Rojekê ji xwe re got:

- Bi Xwedê ezê ji xwe re mîhekê bifroşim. Hema çer dibe bila bibe? Rojekê şivan li ber pezê xwe bû, bala xwe dayê waye tacirekî pez jî wê de tê. Şivan çû pêşiya təcîr, jê re got:

- Mîhek min heye, ma tu nakirî?

Təcîr got:

- Ez dikirim çima nakirim.

Şivên mîhek firot təcîr. Şivan êvarî gava vegeriya malê, mêrik bala xwe dayê waye mîhek kê m e. Ji şivên re got:

- Mîhek kê m e.

Şivên got:

- Na ne kê m e.

Mêrik got:

- Lawo, waye neh mîhî ne. Ma ne vêsê gava te pez kişand deh bûn?

- Şivên got erê deh bûn.

Mêrik got:

- Lawê min, lê vaye nuha neh in.

Şivên got:

- Erê, ji xwe neh in.

Mêrik dît ku tiştekî ji şivên sadir nake. Rabû çû ji nav gund deh peya anîn û ji şivên re got:

- Lawo, ma ev ne deh meriv in?

şivên got:

- Êrê deh in.

Mêrik carek din got:

- "Ma gava vêsê te mîhî birin, ne deh bûn?"

Şivên got:

- Erê deh bûn.

Mêrik ji peyan re got:

Her yek ji xwe re bi serê mîhekê bigrin.

Her yekî bi serê mîhakê girt, yek bê mîhî ma.

Mêrik got:

- Lawo ka mîha vî merivî? Vaye li hev demakeve.

Şivên got:

- Ê bira wî jî ji xwe re bi serê mîhakê bigirta.

Mêrik bala xwe dayê bi ser şivên naxe. Got:

- Baş e emê carek din bikin.

Carek din her yekî xwe çindî mîhakê kir, yek cardin bê mîhî ma.

Mêrik got:

- Ka, vaye cardin yek bê mîhî ma, ka mîha wî?

Şivên got:

- Ma sîcê min e, wî dît ku cara berê yek bê mîhî ma, bira wî jî

xwe bi qurbana xelkê kira û ji xwe re bi serê mîhakê bigirta.

Amadekar: Z. Xamo

Şer di navbera...

Hadin Dalan hatin şehîdkirin, hin kes birîndar bûn û qasî 40 kes jî hatin girtin

Komela Mafên Mirovayî, hin parlamenterên Kurd û heyetên din ji partiyên siyasî li ser bûyerê çûn Licê, piştî lêkolînan, dîtinên xwe bi raporên berbiçav eşkere kirin ku sedemê van bûyaran siyaseta êrîşkar û nîjadperest a dewleta Tirk bi xwe ye.

Bûyera Licê jî da nîşan ku gelê Kurd êdî gefên dewleta Tirk a xwînxwar danaqurtîne, hustuyê xwe li ber dijmin xwar nake, bi hûr û girên xwe, bi jin û mêrên xwe mîletê Kurd di berxwedanê qehremanî ya dozê adîl de ye. Doz doza xelasî û azadiya mîlet e. Doz doza jiyanek bi rûmet û serbilind a însanî ye. Loma di dilê mîlet de kûr reh berdaye. Vegera jî dozê êdî nemaye.

Vedat Aydın di...

Eşkere bû ku mahkemê ji tîrsa xwe ya ku wê doz li ser rûreşîya wan hê girantir bibe, ew tahlîye kirin û roja mahkemê paş de dan. Lê gava ecel were xelasî jî tune. Ji îro pê ve di çî gavê de dibe bila bibe, siyaseta Tirk a nîjadperest û rûreş wê derban bixwe.

Liberxwedana Vedat Aydın û Ahmet Okçuoglu di nav mîletê Kurd de bûn sebebê kêfxweşî û serbilindiyek mezin, moralek bilind da têkoşîna mîlî ya gelê Kurd.

Agahdarî

Bi zimanê Tirkî û Kurdî (Kurmancî-Zazakî) her babet nivîsî tî nivîsandin. Nivîsî bi datayê (komputerê) tî nivîsandin û mîzanpajkirin.

bo agahdarî

Tel: 08-7407027

DIYARBEKİR DÎ ŞEWA HEQÊ MÊRDİM

Hesenî GIRAN

Vizêr heştê aşma Araliqî, hinzar û new sey û neway bi. Se'efî newêsi rî des waştîni ez şiya Sînema Dîlan a Diyarbekir. Hindi sexlet bi, hindi sexlet bi ki mevaji. Berê torteberî di wezî-fedarî da'wetîya mi mi dest ra girewti, kişta ja dimay û tepa day mi. Ez vîşeya mêrdiman ver zor-çiqiyam viyarta şiya zerre, wezîfedaran ra yew keyneka ciwana ze'ifeka şabeweşi cay mi mi nawit, ez ronîştâ.

Cay heme debîy, salona Sînema Dîlani gillî ra biya. Vanî biletî pêro amey rotîş, di sey ten zî bêbîlat girewto zerre hewna zî tanî teber a mendî. Qorî ha zere di, kişt û kinaranê saloni di pay ra vindertî. Saloni di vengê sazan yeno, tanî meqamê Kurdan cenênî. Ma goştarenî. Da'wetîya di nuştawo ki şewi se'et newêsi di dest pey kena. Labrê se'et newêsi û nêmi bi, hima zî programî dest pey nêkerdo. Erey destpeykerdişê programî yew kemanî nawneno.

Spîkera ki şewi akerti, xwi heway Kurdan têbestbi. Yew mexmeli xwi ser ro daybî, çatmey xwi pey temezîyanê suran û zerdan û kihoyan bestbi. Spîkeri yew şîra Kirdasî wendi, dim a îdarekerdoxanê Cemîyeta Heqê Mêrdiman a Diyarbekir ra yew camêrd hame mîkrofonî ver. Va "inka ma samedê hurmetê şehîdanê xwi rî yew deqa pay ra vindenî." Miletî heme ca di weriştî pay. Qorîni destê xwi yo çep berz kerd, qorîni nêkerd, ma şehîdan rî yew deqa bêveng pay ra vindertî. Vindertişê hurmetê şehîdan ra pey keyneka spîkeri yew şîra Kirdasî wendi. Şîri qalê Diyarbekir kerdîni. Şîri ra pey, spîkeri va "İnka serekê Cemîyeta Heqê Mêrdiman a Diyarbekir Xetîb Dicle (Hatip Dicle) yeno kursi." Xetîp hame, dest bi qalanê xwi kerd.

Xetîb Dicle qalî keno

Şewi di en derg û en weş Xetîbî qalî kerd. Qalanê xwi di behsê mucadeley xelisiyayîşê mileti û kar û gurey Cemîyeta Heqê Mêrdiman kerd, behsê sinifa karkeran kerd, va "Hêdî hêdî 'emeley û paley zî heqê xwi wazenî." Qalî ardi qirkerdişê Helebçe û çekanê kimyayîyan ser, va "Ma gunekaranê inî qirkerdişî la'netkar ilan kenî, ma gunekareya jîni xwi vîr a nêkenî." İna qalî ser ra Xetîbî rî çepiki amey kutîş. Xetîbî va "Rojhelato Miyanîni e Rojhehelatê Miyanîniyan o" (Ortadoğu Ortadoğulularındır). Va "Ma ina mintîqa di emperyalîstan û gonîweran nêwazenî." İni qalan ra pey dey rî newe ra û derg û dila çepiki amey kutîş. Xetîbî va "Ez şîma ra yew çî persena. Şîma ra yew esto ki ceng (lej) wazeno?" Se ra neway û pancê (%5) goştaritoxan pê fek ra va "Neeey! Ma ceng nêwazenî!" Xetîbî dewam kerd, va:

"Welatê ma di yew cengo

pîs dewam keno. Wa ino cengo pîs wedariyo, hewa niyo. Welatê ma di heqê mêrdiman binê payan d' o. İni zulumî rî hinî bes o! Kam kişta ki qewetin a, a kiştî qayîdeyan ronana. Kişta qewetini ezê dawo mileti, ta'da mileti kerda. Hefisxanan di hefsî kiştî, işkence kerdo, heqê mileti wardo. Heq kewto binê postalan. Kişta ki bindest a, bêqewet a û ze'if a, nefis û namûsê xwi mudafe'e kena. Xwi mudafe'ekerdîş suc niyo. Bêrênê ma hesranê mayanê Kurdan û Tirkan bi'edilnî. Ma wazenî ki vengê tîfingan bibiriyo. Wa mutareke viraziyo."

Dim a Xetîbî qalê zîwanê dayki (anadil) kerd, va "Hetî ra Özal û Kozakçioğlu beyanatan danî vanî 'ebi zîwanê dayki qalikerdiş serbest o', hetî ra zî imbazê ma **Wedat Aydın** (Vedat Aydın) o ki Ankara di Kongra Cemîyeta Heqê Mêrdiman di Kurdkî qalî kerd, ame girewtîş, tewqîfê jey hame birnayîş. İna diriyey û sextekarey a. Ez ewta di wazena şîma rî menze-reyanê mêrdimanê ma ra çend hebî misalan bida: Mintîqa Botanî di hukmatî 'erd mayin kerd, dewî veng kerdî. Dormarê Siirt, Şirnaq û Wanî di dewijî çadîranê mûyinan di setîrenî. İni dewijan bêhemdê xwi dewê xwi ca di verday, wazenî ageyrî dewandê xwi. Dewê jîni çimandê jîni ver ra nêsonî. Nizdî hinzar gedî, samedê serd û belengazey û bêwayîrey ra merd. İno qitl o. Ayê ki sebebê inî qitlan ê, roj yeno ti ra hesab yeno persayîş. Wa ino xusus weş bêro zanayîş. Ma Kızılay da'wet kerdî, ma va 'inî mêrdimanê bêwayîran rî ardim biki', Kızılay xwi ra nêhamey, hetanî eyro cewab zî nêda ma. Ay dewletanê ki Peymana Kemîkerdişê Hêzê Konvansiyonelî ya Awrûpa (Avrupa Konvansiyonel Kuvvet İndirimi Antlaşması) imza kerda, wa xwi ver kwî, bişermayî, 'eyb o!'

Xetîbî dewam kerd, va : "Cenî ma mucadele di vernî d' î. İno yew averşiyayîş o. Ma jîni pîroz kenî... 'Ednan Bağcayo Siverekîj (Siverekli Adnan Bağca) û 'ereba xwi vinî bî. Hetanî eyro veng ti ra nêveciya. Eskeran şeq qaçaxçî tebiştî, berdî Tabura Gever (Yüksekova) di tîfingan fek a nay, kiştî. **Hesen Kayayo** gawan (çoban Hasan Kaya) û **Mela İbrahim** (İbrahim Döner) tîmanê hukmatî qetil kerdî, kiştî. **Yağub Aktaşo Dêrikîj** (Derikli Yakup Aktaş) zî eskeranê hukmatî ezîyet û te'da reydi kişt. Ma veynda organizasyonanê demokratîkan û gazete û mecmu'ayan danî, wa inî dubarî ca di

verdî. Eki desta ma yî û ma di ardim kenî, wa mucadele biki, wa ina neheqey qeub nêki. Nêki ma jîni di zî mucadele kenî, ma jîni zî teşhîr kenî, mileti nawnenî."

Xetîbî bi inahewa qalê xwi qedênay, goştaritoxan rê sipas kerd û mîkrofonî ca di verday. Dey rî zav zav çepiki amey kutîş. Yewna şîra Kirdasî waniyay. Ti ra pey mesajê mecmuayanê **Medya Güneşi, Deng, Özgür Halk** û sewbîna tanî mesajî hamey wendiş. Spîkeri va "**Avukat Zubeyîr Aydar** zî ma miyan d' o. Ma jey da'wet kenî mîkrofonî."

Zubeyîr Aydar kîrr, labrê m'anedar qalî kerdî, va "W a vengê mi şero aynan ê ki welatanê Awrûpa di nê zî sewbîna welatan di şewan tertîb kenî! Jîni mucadelî reydi ay heq qezenc nêkerdo. Ay heq sewbîna miletan qezenc kerdo, dawo bere. E ay heqanê şarî reydi şewan tertîb kenî. Labrê ina şewa ki emşo ewta tertîb biya, mucadelî reydi biya. Ma cûka ewta resay. Multeciye ma yê ki Awrûpa di û sewbîna duyelan di yê, wa vengê mi bieşnawî! Wa ageyrî bîri inî 'erdê muqeddesî ser. Wa bîri ewta mucadele biki."

Qalanê Zubeyîr Aydarî ra pey çendna mesajî amey wendiş. Be'dê mesajan, hîri şîrê Tirkî amey wendiş. Dim a **Bilgesu Erenus** a deyrbazi amey sehne di cay xwi girewt, enstrumanê xwi, gîtara xwi akord kerdî. Verî verkan deyîra "Megrî" ya Kirdasî vati. Goştaritoxan gama ki ina deyîri eşnawiti, pê fek ra tililî anti. Bilgesu Erenusi "Megrî" ra pey bi Kirdasî deyîra "Canê", bi Tirkî deyîra "Halepçe" û yew deyîra ki qalê ja şîra Bertol Brechtî ra giyriyaybî, vati. Deyîran ra pey deyrbazi çend hebî qerenfilî vistî goştaritoxan ser, va "Berî, bidî mayanê xwi." Deyîra peynî ya ki Bilgesu Erenusi vati, yew deyîra Kirdkî (Zazakî) bî, labrê mi weş fa'm nêkerdi.

İna deyrbazi ra pey, goştaritoxan çepikanê tempoyinan reydi 'Ednano dengbêj waşt la 'Ednan nêveciya sehne. Xetîb Dicle ame sehne, îzehet da, va "'Ednan tebişiyawo, tewqîf biyo. Ay samed ra nişno bêro. Labrê yew 'Ednan şero zî herinda jey di sewbîna 'Ednanî veciyênî."

Dim a yewna dengbêj hame sehne. Raştameyîşê weşî bewnî ki namey inî dengbêjî zî 'Ednan bi. İni 'Ednanî des-duyes hebî deyîrê Kirdasî vati, zav zî weş vati. Mi xwi pîze di va mela yew-di deyîranê Kirdkîyan (Zazakîyan) zî vajo, çi heyf ki nêvafî.

Peynî di yew şîra Kirdasî hamey wendiş. Ekîba kay hamey sehne, dawul û zurna reydi govendi girewti, çepiki û nazo kay kerd. Şewi bi ay hewa qediyay, goştaritoxî vila bîy.

Diyarbekir, 9. 12. 1990

BERGÎR Û VERG

arêkerdox: BRÛSK

Rocîk yew bergîr benû. Bergîr benû extiyar ow warî yî yî gîn ken teber. Ken teber, bergîr şin ver eynî, şin war, şin acêr. Toy ca şin, yew mêşin ha xo r' ay cêr a ya. Von:

-Wakey, bê ma xo r' şî Mergey Mîro biçer.

Mêşin wardena kona bergîr dim a. Toy ca şin, ewnên yew lu z' ha uca çikal kena. Lu vona:

-Bira bergîr, ti se ra şin?

Von: -Wakey, wila ez xo r' şîna Mergey Mîro. Ma xo r' şin çeren.

Vona: -E zî xo r' yena uca.

Von: -De had ma şî.

Toy ca şin, yew zerenci z' ha uca. Zerenci vona:

-Bira, şîma se ra şin?

Von: -Wilay ma xo r' şin Mergey Mîro çeren.

Vona: -Şîma mi z' ken way xo?

Von: -De bê ma xo r' şî.

Mêşin û lu yû zerenc û bergîr, çeher heme kon rê şin. Şin, şin, şin, nizdî Mergey Mîro ben, ewnên yew verg ha uca. Verg von:

-Bira şîma se ra şin?

Von: -Wilay ma xo r' şin Mergey Mîro d' çeren.

Von: -Mi z' dekin heval xo. Şîma mi z' nêken bira?

Von: -Bê.

Don piro şin. Şin, ey bergîr uca çerenû, lu xo r' şîna çikalo-mikalo ona wena, zerenci çerena, mêşin çerena. Çeren, çeren, çeren, pêri ben zexm. Pêri ben zexm. Verg uca pîze fereknên, çik çin. Rocîk von:

-Bira!

Bergîr von: -Ha

Von: -Bira, ena lu çikalo ona dekena miyon in vaşî. Ti ena lu bidi, ez bor, ez biya veyşo.

Von: -Liya ena lu way ma ya, ma senî bori? Ma wayey girewta.

Von: -Bira, bid mi ez xo r' bor.

Von: -De xo r' şo bo.

Şin, kon lu dim a, lu tebşen, kişen, wenû. Wenû, ey çend roc aston-maston ya koçen, reyna ben veyşo. Ben veyşo, von:

-Bira!

Bergîr von: -Ha.

Von: -Ti ena zerenci z' bid mi ez xo r' bor.

Von: -Liya zerenci way ma ya, ez hîn nêdona to!

Bergîr ken nêken ewnên vergî r' înkô nêvînen, von:

-De şo bo.

Zerenc lîş bena, şin zerenci z' wenû. Monen verg û mêşin û bergîr.

Ey verg reyna biyo veyşo, geyren loqmew xişin, von "ez mela bergîr bor". Von:

-Bira!

Bergîr von: -Ha.

Von: -Ma di biray bes î, verd' ez ena way xo z' bo.

Von: -Liya way ma ya. Ma di bira y, yew way ma ya, senî ti wen?

Von: -Wilay ti don, ez wena.

Von: -De xo r' şo bo.

Şin mêşini z' erzen 'erd kişen, wen. Neyse, aston-mostan ya dî-ri roc koçen. Ey verg o. Bergîr von "wilay dewr omeya mi, micit (muheqqeq) en xo verden mi ra." Warzeno, von:

-Bira!

Von: Ha.

Bergîr von: -Bê ma xo r' yemno r' sond bon.

Verg von: -Bê ma yebno r' sond bon.

Bergîr vergî ra von: -Bi ser bî to herçî ez to d' bêbextey nêkenû!

Verg iz von: -Bi ser bî to, ti bimrî z' ez goşt to nêwenû!

Von: -Temom.

Uca bergîr to von "de vind ez cerebey yî vec". Bergîr xo erzen 'erd, pencon xo 'er ra çarnen. Verg şin-yen, von:

-Se biyo to biray mi?

Bergîr von: -Se b' mi? Zerey mi tîr dekewta, ez mirena. Bê ez to r' westî kena.

Von: -Hoo biray mi, Hûmay nêk ti bimrî.

Verg dor-marey yî şin-yen, bermen, von:

-La ki ti bimir, ez goşt to z' nêwena, ez se kena? Vergî binî bîri goşt to borî, ez ki vind bewn ti ra. Ez ki xo r' se kî? Ez teqena!

Von: -Ney ney biray m' çik nêben. De hela biney zer-merey mi ferekin, belkî ez bib aso.

Bergîr lingon xo lepênenû, hes-vengî xo nêken.

Ey biyo ti von qisîr bergîr o. Wilay verg dor-marey yî şin-yen, fereknên, boy ken, von "temom". Ewnênû bergîr ruh xo ra vecen, qestî lingon xo derg ken. Verg dor-marey yî şin-yen, von:

-Ez konca d' piro bî, ez miyon hakon neremo d' piro bî?

Yû ki en cis von, wilay bergîr ewnên êh hîn ben ti ro, hema çutmo virr don tehtey çarey yî ro, uca paşt ser don 'er o û pey paşkilo ser a geyrenû, von:

-Herew bêbext! To mi ra va se?


Vergi z' uca geber benû*.

* Na fistoniki heway vatîşê yew cenîya Nihîriji ameya nuştîş (Nihîr yew dewa qezayê Hênî ya û Dewleta Tirkîya namey na dewi bedîlnawo, kerdo Gürbulak. Hênî yew qezayê Diyarbekir o).

Ji bo serxwebûn û yekîtiya Kurdistanê.

Ji bo dostî û biratiya gelan di zîndana Diyar-bekirê de li dijî zilma dijmin û neyaran li ber xwe da û şehîd ket.

Ew di dilê gelê me de diji.




Hevalên wî

Necmettin Büyükkaya (Selah)
1943..... - 23. 01. 1984

Agahdarî

Piştî bûhabûna postê em mecbûr man ku buhayê Armancê zêde bikin. Ji nuha û pê ve buhayê Armancê ji bo xwendevanên welatên Skandinawî **15 Kron e**. Lê me ji bo abonetiya salê, buhayê wê di **150 Kronî** de hişt.

Xaçepîs



Amadekar:

S. Rêving

Qayîm, saxlem b- Vexwarina ji mast û avê çedikin (berevajî) c- paşdaçek (berevajî) 3- a- Stranbêjeke bi navûdeng a kurd 4- a-Dehbeyek (berevajî) b- Peyveke pîrsê (berevajî) c- Înad (berevajî) 5- a- derew (berevajî) b- nexweşiyek c- ne nêr. 6- a- Qefesa kewan b- Xetê ku du welatan ji hev vediqetîne, tixwib. 7- a- Nexweşiyek (berevajî) b- mam c- tazê, yan erdê bê dar û şînayî. 8- a- Şil, ne zuha b- Navê qehremanekî destanake yewnwnîya kevin 9- a- Navê darekê b- ne, nexêr (berevajî) 10- a- Paytextê Sûriye b- Kesê ku rê dinase, rêber 11- a- Duh, roja berî iro (berevajî) b- bi Kurmancîya jêrî: hêvî c- Navê welatekî cîrana Kurdistanê. 12- a- Ji navê kuran b- Navê rojekê c- Cûreki pez, "mêrê bizinê".

Çeperast: 1- a- Qada ku Komara Mahabad a Kurdî lê hat ilan kirin. b- xwarina pir bi xwê. 2- a- pronavekî kesin b- daçek (berevajî) c- Kuliçe, nanê ku penîr, yan goşt û bacanan dixin tê de û dixwin. 3- a- Têjkê mirîşka ku hin nebûye mirîşk. b- her û her, berdewam. 4- Di dîne Zerdeştî de Xwedayê xirabiyê. b- peyveke gazikirinê. 5- a- Moran û xumama dibe -baran û dibare. b- peyveke pîrsê (berevajî) c- Karçînên biçûk ên dêmi. 6- a- Ava ku rawestayê, naherike, yan welê dixuye. b- rêving, rêwingî. 7- a- Pêxemberê pêşî. b- rengê c- Xwarina ku ji ard çedikin. 8- a- kesê avê dixwaze, têhni. 9- a- Dema li gunda xaniyan ava dikin, axê li banê wî radixin, karê ax raxistinê? b- Sûre-

ya ku mirov li ser miriyan dixwîne. 10- a- Mehek b- Dengê çelekan. c- cihê ku mirov, heywan, tîrîmpêl li ser diçin. 11- a- Li Kurdistanê Tirkiyê çiyayek. b- Sala çuyî. 12- Roj (berevajî) b- pîrsê c- roj, ro. d- Navê rojekê.

Serejêr: 1- a- Li Kurdistanê Îraqê qezayek b- Ji navê keçan 2- a-

Bersîva hejmara 110'an

Çeperast: 1- a) Qazî Mihemed. 2- a) ud. b) ma. c) ut. d) nas. 3- a) ramûsan. b) pîne. 4- a) er. b) şingar. 5- a) ol. b) grug. 6- a) ek. b) bi. c) revend. 7- a) parî. b) herki. 8- a) îwêh. b) rod. 9- a) kaşo. b) axa. c) em. 10- a) ez. b) yarî. c) ib. 11- a) nîz. b) nêrî. 12- a) şagird. b) zîvîn

Serejêr: 1- a) qure. b) epîk. c) êş. 2- a) adarok. b) wa. 3- a) pêşeng. 4- a) îmuş. b) bahoz. 5- a) masîgir. b) nr. 6- a) anr. b) îrayîd. 7- a) hungur. b) oxaz. 8- a) et. b) agehdar. 9- a) pr. b) ve. c) îni. 10- a) enî. b) perde. c) év. 11- a) dan. b) nk. c) mirî. 12- a) seridin. b) bîn.

Qulingê Perşkestî

"Guneh e, we çî pê ye. Ay.... ew quling ji refê xwe maye...." Bi dengê kalo ra biçûkan dev ji quling berdan û quling bi hewa ket. Lê lingekî wî li ber kevir û kevkîyan ket û li ba ket û pê ve bi dar da bû. Bi dilekî kul û birîn di wê demê de ku êş û birûska bask û jana lingekî wî kezêba wî dişewitand, li ber çavê zara berze bû. Çend cara ger lêda, li cihêki digeriya ku wê şevê tê da biêwîre. Li dûrî gund gidîşek genimê nekutayî ber çavê quling ket. Ev gidîşa genim ji ber zûhatina danê sermayê û ketina berfa bê weede, li jêr berfê mabû, nehatibû kutanê. Quling li serê gidîşê venişt. Êdî tarî ketibû erdê. Quling bi lingê xwe yê sax berfa li ser gidîşê vemalî û cihê xwe

xweş kir. Lingê wî yê di hûr û xişibî bû û bi her cûreyî heta sibê karî li genimê gidîşê bixoye di nav kuleş da veşêre û germ ke. Gidîşa genimî ji ber şilî û şepeliya, germixî bû, bi bayê sibê hulm û gulmek ji wê qulûz dibû. Quling dil nedida li vî hewayê sar dest ji vî hulm û gulma germ bikêşe. Lê yanûynî bûbû. Teze berê sibêdê gewr dibû ku quling bi hewa ket. Lingê wî yê şkestî pê ve darda bûbû. Eger amanca Firat û germiyanê û bîra refê wî neba, bi çî hêz û karîne nedîşiya zindî bimîne û ji van hemû aşî û afatane xwe rizgar bike. Ewî dizanî ku divê xwe bi refê xwe re bigihîne. Divê ku bi her cûreyê hebe, xwe bi avagerme Firat re bigihîne da ku ji merg û mirina ku

her car bi layê wî de tele û davik venibû, rizgar bibe. Ev bû ku hindî hêz û karîna wî hebû, zor dida xwe û difirî. Êdî zozan û çiyayên kever li pişt xwe hêlabûn û nêzikî li germiyanê dikir. Ew çend şev û roj in ku bêhne-bêhn per lêdaye. Lisê xwe yê par li rex Firat baş dinasî. Piştî çendîn roja, şeqî û mandî xwe bi refê xwe re gihand. Berê xwe dayê refê wî yê şepirze, bê serûber wa ye li nav ava Firat sobekariyê dike. Dema ku gihîste wan, hemû lê berev bûn û bû qîre-qîra wan. Qulingê perşkestî, bi vîyan û şîyan gihîste amanca dilê xwe, lê bi lingekî. Çunkî lingê wî yê şkestî hind sir û sermayê lê dabû ku çî hîvîya başbûnê bo nemabû

Romana Cengîz Aytmatov ...

bûl nakin, win ji li vira ji kes wazên wî qebûl nake. Riya vegeêrê li ber rabûnê û di ber baweriya xwe de tê kuştin. Bi xwe ji bilî Evdî, du lehengên din jî hene ku ne kêmi wî rola xwe dilîzin. Ew jî Bostonê komunîst e û Akbera dêlegure. Merov dikare bibêje ku divê berhema Aytmatov de her sî lehengên paralel bi qerekerê xwe nêzî hev in. Ew xêrxwazin. Erê Akbera lahore û ji celebê duren-

daye, lê dilovaniya wê ji merovên hawîrdor re bêtire û mesele wê (li gora fitriyeta wê) ji yên wan kesian bilintir e. Heger Evdî ji dêrê tê avêtin, Boston ji partiye tê avêtin. Çilo yê pêşî ne ji ber gunehan keşîş wî qebûl nakin, wilo jî yê dawî ne ji ber kêmasiyên xwe, berpirsiyariyê rêxis-tinê wî davêjin. Bi xwe nivîskar bi vî yekê, di-xwaze ji me re bibêje; ku hêzên reş ên ne paqij ciyên wan li ku bin, her ew bi tinasên xwe wek

hev in. Loma jî Evdî û Boston dibin qurbana yek jêderê. Çilo riya şer kesên kêşperest gihandin hev, wilo jî riya xêrê û qenciye merovên dilpak û baş dighînin hev. Mane jêdera wan jî yek e! Û tiştê herî girîng li nik Aytmatov ewe ku insan vegere ser rewîştên xwe yên xêrê. Bi çî riyê be, ne xem e. Û ku insan bi insan be, êdî astengên jiyane çareser bibin û dê kamûranî li ser rûyê erdê belav bibe.

Lêkolînerên Iraqê ...

Di tedawîya wan birîndaran de jahrên kîmyewî hatin tespîtkirin. Di vî nama protestoyê de nîşan dan ku di sala 1980'î de çend doktorandên tibî, kîmyewî û derman-cêkirinê ên Iraqî li zanîngeha Uppsalayê hebûn e. - Me, ew vexwendin ji bo ku em di wê baweriyê da bûn ku ewê di warê zanîyariyê de xwe pêş de bibin û têgîştina bikaranîna zerara narkotîka û madeyên kîmyewî li Iraqê bilind bikin. Lennart Deckner wê çaxê jî biryara xwe dabû ku êdî lêkolînerên nû yên ji Iraqê ji bo înstîtuta toksolojîyê neyên qebûl kirin. Fakûltetê tu carî li hember vî rewşa wergirtina van xwendevanan bersîvek negatîf nedan. Lennart gotina xwe wiha didomîn e; - Dibe jî ku di nav xwendevanan de ajanên Iraqî hebûn. Lê ew çar xwendevanên me vexwendibûn wan karê xwe dizanibûn û dikirin, tu şikek me li ser wan tune bû. Dibê mirov di eynî wextê de weyne bîra xwe, ew kesên ku ji bo xwendina xwe derdikevin derwayê welêt dibin xwedî zanîyariyê û hînî lidij derketinê jî dibin. Ji ber vî yekê, derketina wan

a dervayî welêt gelek pêwîst e. Di salê de em çend xwendevanên biyanî werdigirin înstîtuya toksolojîyê. Lê em tenê dikarin çend heban qebûl bikin. Ez li dijî wergirtina kesên ji Libyê jî derketime.

Werger: Ş.Zîrek

Ronîkirinek kurt li ser vî nivîsê. Ev nivîsê jorîn di 27 ê Çirîya Pêşîn di Rojname Uppsalayê Nya Tidning de di rûpela pêşîn wek bûyere girîng hat weşandin û min jî bi kurtî ji bo xwendevanên Rojname AR-MANC'ê wergeran Kurdî. Berî her tişî, bi eşkerekirina vî bûyera xwendevanên Iraqî em gelek dilşa bûn. Ji ber ku ew çend sal in ku hin rûniştvanên Kurd li bajarê Uppsalayê û berpirsiyarên rêxistinên Kurd ji Kurdistanê Başûr ev pîrsa xwendevanên ji Iraqê birin ba demûdegehên zanîngeha Uppsalayê. Lê çê mixabin ku, berpirsiyarên Zanîngeha Uppsalayê bi tevayî ew şik û gumanên li ser xwendevan û doktorandên ji Iraqê bê bersîv dihiştin. Lê, du roj piştî bûyera hov a li bajarê HELEBÇÊ

bû, em runiştvanên Kurd li bajarê Uppsalayê bûn şahîdê "durûtiya" berpirsiyarên fakulteta BMC (fakulteta kîmyê û biyolojî). Ev ne tiştêki tesedûfî bû (!), tam du roj piştî qatîlîma HELEBÇÊ, bi beşdarbûna konsolosê Iraqê Sadîk Alî Saban, xwendevan û doktorandên ji Iraqê û vexwendiyên Swêdî, Afrîkayî Ereb û h.w.d "şevêk Kêyfe" bi reqsa Erebî ku bi keçên Swêdî hatibû pêkanin çê kirin. Piştî ku hin Kurd ên li Uppsalayê bi pêkanîna vî "şeva kêfê" agahdar bûn ji bo protestokirina vî şevê gelek endamên Komela Kurdistanê û kesên Kurd li ber derê fakulteta BMC li hev civiyan û nerazîbûna xwe pêşkes kirin. Lê çî mixabin ku berpirsiyarê fakultetê guh neda Kurdan. Wan bangî polîs kirin ku Kurdan ji ber derê fakultetê bi dûr xînin. Lê Kurd belav nebûn heta ku bi alîkariya polîs konsolosê Iraqê bi dizî di deriyê paş re ji wê derê revandin. Bi dîtîna min eşkerebûna xwendevanên Iraqî û tîkîf-yên zanîngeha Uppsalayê bi hikûmeta Iraqê re, baş bû. Lê hîn gelek danûstandinên nehênî hene ku em pê ne agahdar in.

Şoreş Zîrek

Romana Cengîz Aytmatov a dawî "Pilaxa" (Fersîk)

B. Nazê

Dema berhemekî nuh ji bin çelema Aytmatov dertê, pêre-pêre babisokê di nav xwendevanan de li pey xwe dixîne û di nav rexne giran de, dibe mada guftogoyek fireh û dirêj. Di vî warî de romana wî(pilaxa) ne awirteye. Lê tiştê balkêş ew bû ku rexnegiran rexnen xwe dibirin ser kêmasiyên avakirina bingehê romanê bi xwe. Ew dibêjin ku kompozisiya berhemê bi hev ne hunandiye û ji çend bergehên bûyerên serbixwe, bêyî ku bi hev girêdayîbin, çê bûye. Yan jî dibêjin, Aytmatovê romannivîs û ev kêmasiyên ha?

Bi rastî jî ji nêrîna pêşî xwendevan bi nehev girêdanan bûyan di romanê de, dihise. Çimkî "Pilaxa" ji wan berhemên aloze û ji xwendevanan tê xwestin ku ew xwe bi xwendinê biêşînin. Ev alozî ji ber guhertina bûyeran ji nişkave tê. Û ew pira ku wan digihîne hev, xwendevanan nikare zû bibîne. Ji ber vê yekê roman ji alî kompozisyona xwe ve wek çend çirokan ne bi hev girêdayî tê dîtin. Lê (ji aliyê fikra xwe de Aytmatov ew bi hepokî pola nexên tevnê kutane ser hev û xalyiek spehî ya rengo rengo çêkiriye. Bi xwe bergehên kompozisyonê yên romanê bi tayên fikrên wê yên bingehîn digihên hev. Ji ber vê çendê merov dikare bibêje ku; "pilaxa" ji çend perçeyên ku ji zikê hev dertên çêbûye û ji hev nayên perçe kirin. Û bê vî tiştî dê roman wek tejekê bê serûber bihata xwiya kirin.

Gelo romana "pilaxa" li ser çiyê? Yan jî fikra wê çiyê? Helbet, emê bi kurtî herin ser bingehê pirsê, ji ber ku ramanên di berhema Aytmatov de, wilo bi şax û bax in, dê merov nikaribe di çarçevê teng de, heqê wê bide. Romana "Pilaxa", berî her tiştî bi tema xwe felsefî û civakî ye. Bi sujêta xwe (bi xezên pêşketina bûyeran) pir e, her yek ji wan problemek serbixwe di xwe de gewde dike. Problemên bingehîn ku di wan de serê xwe radikin ev in:

- Parstina xuristê û lahorên wê.
 - Parstina rûmet û paqijiya merovan
 - Pirsaweriyê li cem însan.
- Bi xwe ji xala dawî, problemên jorîn yan çareser dibin an jî gur dibin. Bi gotinek din bîreweriya li nik însan, ew kaniya ku çem jê diçe. Xwezî diyar dibe, ku Aytmatov mîna Dostoyevskî (di

romana "Kawik" de) gelekî xwe êşand heya lehengekî amade be xwe li ber baweriyê bikuje, bibîne.

Em pê dizanin ku Dostoyevskî berê nivîsa romana xwe digot "Ez dixwazim însanekî wiha paqij bikim lehengê da ku bikaribe gemara civakê li ber xwe bibe." Û Dostoyevskî Mîr Muşkîn ê Kawik (di nêrîna civakê de) ji xwe re dît. Wilo jî em dizanin ku ev leheng ne li gora dilê nivîskar bû.

Ew di heyema sedsala 19'an bû, lê di heyema ku lehengî di civakê de bûbû karekî rojenî, çilo nivîskar diwarî di dîtina lehengekî pozîtîf de, didît?

Erê, rast e heger di qonaxa berî Şerê Cîhanê yê Duyem û piştî wî, ji ber baweriya bi paşerojê, lehengî bûbû karekî rojenî, lê piştî salên 60'î, gelek tişt belî bûn ku hiştin baweriya millet bête şikandin. Îdî bi vê yekê krîzekê di civetê de dest pê kir û siyaseta derew û xapandinê ji dewletê re bû ya resmî. Îca çî xêr ji civaka li ser derewan bête avakirin heye?

Heqê kê û xapandinê hebe, lêbelê wê heqê nivîskar nebe. Ji ber ku ew wijdanê gelê xwe ye. Aytmatov jî yek ji wan nivîskaran e ku berhemên wî bûne neynika jiyana milletê wî. Me hîn ji bir nekiriye, çilo rexnegiran di salên 70'î de, tîrêjên rexnen xwe dibirin ser çîroka wî ya "Gemiya Sipî" û digotin: "Derew e, nabe ku zarok di civaka me ya sosyalîzmê de, xwe bikujin.." lê hate xwiya kirin ku rastî bi nivîskar re bû.

De, emê vegerin ser romana Aytmatov. Xwendevan pê dizanin ku nivîskar di gera xwe de, lehengekî wilo dît, ku ne dêr e û ne hukûmet jê razîbûn. Weku dibêjin ew ne ji Xwedê re û ne jî ji ebdan re dibû. Evdî (lehengê romanê) destpêka qonaxa pêşî ji xortaniya xwe dide ser rîya olîtiyê. Ew li dêrê dibe şagirtê keşîşan. Di baweriya wî de, ewê bi vê riyê giyanê însan paqij bike û ji gunehan dawêşîne. Lê ji ber nêrînen xwe (pirê caran di jî talimên dêrê bûn) tê avêtin. Erê ew jî dêrê tê avêtin, lê baweriya wî, nayê şikenandin û dikeve nav xelkên ku dîn û îmkanên wan bûne pere. Ew dikeve nav wan, da ku wan ji rîya şaşitiyê vegeşîne. Lêbelê çilo, li dêrê gotinên wî qe-

Dûmahîk: r. 11

Ferhengê Lîteratûrî

Amadekar: Bavê Nazê

Lîrika

Lîrika ji gotina Yunanî "Lyricos" hatiye. Mana wê ji sitrana li ber saza lîrikê tê. Ew cinsek ji cinsên lîteratûrî ye. Li gora Hêgil, mada lîrikê ya teswîrî jiyana însan ya giyanî ye, cîhan, raman û hîsiyeta wî ye. Bi gotinek din; bingehê berhemên lîrikî, mûanata însan e. Bi xwe bi rîya jana dil cîhan û jiyana helbestvan tê zanîn û karekterê wî tê naskirin. Û ew haletê şexsan ku di lîrikê de tê rengvedan, dibe mada şexsiyeta hunerî. Yanî mûanata bi xwe formek tîpîk ji cîhana însan ya giyanî distîne. Ew rewîşt dihêle ku lîrika ji cinsên edebî yên din cuda dibe. Da ku helbestvan bikaribe hemû dewlemendbûn û pîraliyê mûanata ku însan di bîstikekê de digre, teswîr bike, ew mecbûr e mumkinên tabîrî di zimên de bi kar bîne. Divê ew, wan gotinên ku bikaribin tîrêjên xwe berdîn dil, can û beden bihejin, bi kar bîne. Bi forma xwe jî, pêwîst e ku bêje di hundirê xanên di şîrî de li hev hatibin ku meriv ji spehîbûna wan çêje bike.

Di berhemên lîrikî de, sujet û bûyerên lipeyhevhatî, tunene. Bi xwe ev rewîşt ji yên berhemên êposê ne. Lê carna wiha dibe ku merov pêrgî rengên wiha di lîrikê de jî dibe. Êdî ew rengê lîrik-êposê distîne.

Di heyamê Antîk û serdema Navîn de, tavil rengên lîrikê dihatin dayîn, lê di dema me de, ev reng kerekterê şertî distîne. Û rengên lîrikê ev in: helbestên bi forma naman ku (dostanî yan evînî). Helbestên êpîgramî (bi qerfayetî). Helbestên êpîtafî (yên şîrî). Helbestên êlêgî (yên kovan û xemgînî). Ev rengên ha ji heyamê Antîk hatine stendin û ji

ber pêşketina civakê, gelek ji wan dilêma xwe winda kirine û nema bi kar tên.

Dibe ku xwendevan di lêkolînên edebî de pêrgî tîrminên wiha bibe, lehengên lîrikê, yan jî "lîrîkîskî otstipleniyê". Ev termîna dawî bi mana xwe ya herfî, wilo tê "derketina lîrikî". Lê bi maneya giştî, ev termîna bi kar tê pêla ku nivîskar ji babetê ku tê de ye, dertê û ji dûr ve bi awakî felsefî zahîrak ji zahîrên ku bi tema wî ve girêdayî ye, rave dike.

Herçî lehengê lîrikê, ew şexsê helbestvan di qesîda ku bi pronavê "ez" de tê nivîsandin. Lê nabe ku tetabîq di navbera helbestvan û lehengê wî "ez" de çê bibe. Wilo jî nabe em mûanata di lîrikê de bikin ji hîsiyeta şair. Çilo di cinsên edebî yên din de, leheng û nivîskar nabin yek, wilo jî lehengên lîrikê û helbestvan nabe bibin şexsek. Bi vê yekê lehengê lîrikî dûrbûn û kûrbûnek din distîne û ji bilî hestên helbestvan, ew hestên merivên tîpîk jî, di xwe de gewde dike û distîne...

Drama (Dramatûrgiya)

Ev termîna ji gotina Yunanî "Drama" hatiye. Ew jî bi mana neşatê (lebatê), tê. Bi xwe drama cinsek ji cinsên lîteratûrê ye bingehîn e. Ji bo ku tevlihevbûn nekeve navbera drama wek cîns û drama wek reng, bi zimanê Rûsî, hin lîteratûrmas termîna dramatûrgiya bi kar tên. Li gor wan dramatûrgiya cîns e û sê rengên wê hene; **Drama, Komediya û Trajediya**. Lêbelê lîteratûrmasin hene ku dramê bi mana fireh distînin û navê cîns lê dikin. Û eynî termîne bi manak teng bi kar tênin û wek rengê edebî dihesibînin.

Di vir de, emê drama bi du mana

bistînin û ji ber vê yekê emê bibêjin ku sê rengên drama, hene û ew jî ev in; **drama komediya û trajediya**. Gelo xisletên drama wek cînsê lîteratûrî çî ne? Berî her tiştî divê bê gotin ku ew tê nivîsandin, da ku li ser sehna şanoyê bête listin. Drama bêyî lîkstika aktorên, huneriyek kêr e. Ji bo ku lehengên edebî dramî bêne famkirin, pêwîst e ew bêne dîtin û bihistin. Heger cînsên lîteratûrî yên din (epos û lîrika) fenin (hunerên) gotinê ne, lê fenê dramayê gotin û listik bi hev re ne.

Bi xwe ji bo xisûsiyeta xwe, edebê dramî ji yên din aloztir dibe. Ji bilî rewîştên giştî yên ku pêwîst in ji bo edebî, pêwîst e nivîskarê dramî cîhan û teknîka şanoyê xweş bizanibe. Divê nivîskar rê bide lehengan, da ew bi xwe bipeyivin û bi xwe herin û bên. Di vir de, gerek şexsiyeta nivîskar nebe, gerek winda be. Tenê ew dikare, di piyesa xwe de remarka (tenbîha) (1) bide halet û lebata sîxûsan. Jê pêve divê, bûyer bi rîya diyalog û monologan bi pêş de biçin û bi vê yekê hêdî-hêdî kerekterên lehengan vebibin û bêne naskirin.

Ji bilî van xisletan, xisletek din ya taybetî ji edebê dramî re heye. Ew jî sînorkirina bûyeran, di wextek teng û konkret de tê. Divê bûyer di hundirê (2-3'ê seetan de) bêne qedandin.

(1) Remarka ji gotina Frensî remarque tê. Mana wê mûlahezat an tenbîh e. Bi vê yekê nivîskarê dramî demen, temen û kincên lehengan xwiya dike û her wiha ji ew dikare haletê lehengan ên nefîs rave bike. Wilo jî ew çî bergehên (dekor) şanoyê teswîr û bi nav bike.

ne karê aqîla ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

Lêkolînerên li Unîversîta Edînbûrgê datayekê (kompîtoreke) nuh ku dikare gotinan bibihîse, nas bike û fam bike, çêkirine. Sîstema ku di vî datayê de heye dikare şaşitiya telefûzê û tewandina gotinan jî bêje. Ji vî sîstema datayê re OSPREY tê gotin û di xezîna wê de 20. 000 gotin hene.

Japoniyan telefonê nuh çêkirine. Kesên ku bi vî telefonê telefonê dikin dikarin dengên xwe eyar bikin. Mîrov dikare dengê xwe tenik, qalind an jî seksî bike.

Li Unîversîta Houstonê superkabloyek nuh çêkirine. Mîrov bi vî kabloyek dikare serê 1 m kare 40. 000 amper derbas bike. Ev kabloya nuh ji seramikê hatiye çêkirin.

Lîtosfer tebeqa dinê ya der e û qalîkê dinê yê jî kevîr e. Kûrayîya lîtosferê 100 km ber bi jêr ve ye.

Li gor lêkolînên ku hatine kirin; hejmara beqan di dema qirêjbûna hewayê de kêmîr dibe. Beq jî qirêjbûna hewayê û bi taybetî jî ji qirêjbûna kîmyayî pîrr hessas in.

Di navbera Fransayê û Îtalyayê de tunelek bi navê Tunela Mont Blanc heye. Tunelê bi xwe 11,6 km dirêj e û di bin çiyayên 4810 m bilind re hatiye derbaskirin. Tunela Mont Blanc di sala 1965'an de ji trafikê re hat vekirin.

Japoniyan mîroskopek nuh çêkirine. Bi vî mikroskopê mirov dikare di saniyekê de 150 milyon instryksiyon bistîne û mikroskop li dinê ya herî bi lez e.

Li planeta Merkuryûsê nava rojê 400 derece germ e û bi şev jî -198 derece sar e.

Fîşa abonetiya Armançê

- Salek
- Şeş Meh

Abonetiya salekê

Li Skandinavya	150 SEK
Maqam/Myndiqheter	250 SEK
Li Ewropa	50 DM
Li derveyî Ewropa	35 \$

Tarîx:
Nav û paşnav:
Navnîşan:
Welat:

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgîroya jorê bişînin. Fotokopiya kvîtoya heqê abonetiye û fîşa jorîn dagirin li ser adresa jêrîn ji me re bişînin.

Adres: P. Box 6004, 172 06 Sundbyberg/Sweden